
Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1280 | 11-Pûşper-2025 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# Silêman Mihemed; mîrateya hunera bavê xwe didomîne

Navenda Nûçeyan

**Hunermend Silêman Mihemed di sala 1982'an li bajarê Qamişlo ji dayik bûye, dema ku ew bîrwerî jiyanê dibe ji hunerê hez dike, ji ber ku bandoriya hunera bavê wî Nezîr Mihemed li ser wî dike. Silêman li nêzî 7 amûran dide û strana jî vedibêje, herwiha perwerdeyên fêrkirina tembûrê dide û hunerê ruhê ku pê jiyan dike dibîne.**



Huner ruhe, lê ne her kes xwediyê wî ruhî ye. Huner jiyane, lê ne her kes dikare wê jiyanê jiyan bike. Lê gelê Kurd di hunerê de dewlemendin û xwediyê wî ruh û jiyanê ne. Herwiha hunermendên Kurd praniyên wan mîrateyên xwe ji malbatên xwe digirin. Yek ji hunermendên Kurd ku mîrateya hunera xwe ji bavê xwe girtiye Silêman Mihemed kurê hunermend Nezîr Mihemed e.

### Kurtejiyana hunermend Silêman Mihemed

Hunermend Silêman Mihemed di sala 1982'an de li taxa Mehetê ya bajarê Qamişlo ji dayik bûye. Silêman xwendina heyanî refa 5 dixwîne, pişt re dev ji xwendinê berdide, sedemên berdana wî ji dibistanê re jî ew e ku şert û mercên malbatê pê re nebû alîkar ku ew xwedina xwe dewam bike. Piştî dayika wî diçe ser dilovaniya xwe, barê malbatê giran dibe, lewra ew bê çare dibe ku ji dibistanê dûr bikeve.

Bavê Silêman Nezîr Mihemed jî hunermende, lewma dema ku Silêman bîrwer dibe ku di temenê xwe yê 7 salî de, ji hunerê hez dike û bandora hunera bavî gelekî li wî dike, hem jî girêdaneke zêde ya Silêman bi bavê wî Nezîr re hebû. Hunermend Nezîr bavê hunermend Silêman dibistan amadehî bidawî kiribû, hem jî bi 4 zimanan diaxivî ku ew jî zimanê Kurdî, Erebî, Firansî û Inglîzî bû. Nezîr li kêlek xebatên huneriyê xwedî jêhatiya wênesaziyê jî bû. Herwiha Nezîr xwedî 4 kasêtan bû. Di heman demê de helbest bi xwe dinvîsandin û bi awayekî stran vedigot, ew jî helbestên netewî, evînî û xemgînî bû, hem li alava bizqê dixist û amûr jî çêdkirin û çeksaz jî dikirin. Nezîr Mihemed di dema dewletê de di balafirgeha Qamişlo li gel rejîma Baas kar dikir, lê ji ber xebatên wî yên hunerî yê ku li şahiyan mîna cejna Newroz dikir, ew ji kar hat derxistin.

Piştî ku hunermend Nezîr Mihemed diçe ser dilovaniya xwe, Silêman rêya hunera bavê xwe berdewam dike û di hunera xwe de helbestên bavê xwe jî vedibêje, da ku helbest û stranên bavê wî neyên windakirin.

### Zanîna amûran û lêdana wan ji aliyê hunermend Silêman Mihemed

Hunermend Nezîr Silêman bikaranîna gelek amûran jî dizane ku ew jî amûra; Bizq, Cimbiş, Ûd, Tembûr, Bexleme, Org û Derbek e, van amûran bi awayekî xweş lê dixe. Hem jî ew cihê xwe di nava Koma Folklorê Kurdî diger û li şahî û Cejna Newrozê hunera xwe pêşkêş dike. Di heman demê de dikaneke wî ya tembûra heye, hem tembûran dikire û difroşe, hem jî zarok û mezinan grûp grûp fêrî tembûrê dike.

### Huner bûye ruh û ew bi wî ruhî jiyan dike

Silêman ji ber ku bi temenekî biçûk dest bi xebatên huneriyê kiriye û heya roja îro di nava vê xebatê de ye, lewra jidûrxistina hunerê jêre gelekî zor û zehemete, ji ber ku li cem wî huner bûye ruh û ew bi wî ruhî jiyan dike.

Tevî ku hunermend Silêman di jiyana xwe de ji aliyê aborî gelek zor û zehmetî kişandiye, lê dîsa ew ji bo berdewamiya hunerê bi israr bû, şert û mercên jiyanê bi têkoşîna li hemberî wê nîşan dike. Hin ji berhemên hunermend Silêman Mihemed jî ev in: Strana Tu histrên min dibarîne, stranek li ser şehîdan, Dayê negrî ne lorîne, Dema saz û bilile, Bela xweşik buxwînin, Ji te hez dikim, Ew çavên teyî xweşik, herwiha stranek jî li ser dayika xwe çê kiriye.

# Gundê Pirikê

Ayşa Silêman/ Dêrik

**Gundê Pirikê yek ji gundên Xirstiyanan e ku di sala 1954'an de hatiye avakirin û wek gundê kevnar piştî Berebeytê tê naskirin.**



Navê Pirik li vî gundî hatiye kirin ji ber ku di gund de pirek hebû, destpêka avabûna gund hijmareke mezin gundî cihê xwe têde girtibûn, lê bi demê re tu kes nema tenê 5 mal man ew jî pirî caran berê xwe didin bajarê Dêrikê.

### Jiyana gund

Kesên ku di gund de jiyan dikin ji Girê Pirê, Tirpespiyê û Qamişlo ne di sala 1954'an de berê xwe dan pirikê, li wir bi cih bûn û gund ava kirin. Berî ku ev kes werin tenê malek hezexî di gund de hebû. Mezinê gund aş û rez danîn û dest bi jiyanê kirin. Kesên ku di gund de jiyan dikin her tim cîroka başiya mezinê gundê Tildarê dibêjin, dema ku berê xwe dan gund gelek feqîrî hebû û tu tişt ji bo debara jiyanê nebû, lewma mezinên Tildarê ji wan re gotin ku zevî, dar û sewalên me di xizmeta we de ne da ku hûn jiyana xwe berdewam bikin. Gundî qenciya Mala Hecî Osman û Hecî Qasim ji bîr nakin.

Di dema berê de sewalên gundiyan gelekî hebûn, lê di dema niha de tenê du mal mane sewal kedî dikin, sewalê wan jî hindikin. Di dema berê de ji ber pirbûna avê pembû li gund dihat çandin heya sala 2005'an, lê ji ber belavbûna nexweşiya pembû û rêjîma Bees jî bac zêde kir gundiyan nema çand, niha tenê genim lê tê çandin lê ji ber kêmbûna baranê ev yek bandor li rewşa gundiyan kir. Di heman demê de gund navdar bû bi darên fêkiyan û werzê xwe, lê ji ber çikandina kaniyê di dema niha de tiştek nema. Tevî ku ew gundên kevnarin û wek mîras tên dîtin lê jiyan tê de nabe, her tişt ber bi tunebûnê ve diçe. Gundiyên ku hewil didin gund xweş bikin û çandiniyê bikin rastî zehmetiyan tên ji ber ku baran nebariye ku ew zeviyên xwe bi ceneretoran av didin. Lê buhayê mazotê jî roj bi roj bilind dibe û rewşa madî ya gundiyan destek nade ku mazota buha bikirin, lewma daxwaz ji Rêveberiya Xweser dikin ku destekê bidin wan û bi wan re alîkar bin.

Bi kamîreya Ayşa Silêman



## FERHENGA BIWÊJAN

**Em keçelan gulîmor nakin:**
- Pêwîst nake em kesên bêqîmet biqîmet bikin.

**Ew kirasê li te xir e:**
- Navekî mezin li te bûye, lê tu ne li gorî wî navî yî.

**Ez dengbêj im ezê çima dîlokan bêjim:**
- Tişta tu ji min dixwazî ne karê min e, karê min tişteke din e.

**Gelî ma xalî, rûvî bû walî:**
- Ji ber ku ti kes li meydanê nîne ew jî xwe mezin dike.

**Golikên îsal rabûne dibêjin em ga ne:**
- Ne li gorî xwe diaxive; ew bixwe ne tiştek e behsa tiştên mezin dike; gotinên ji xwe mezintir dike.

**Jê re li çepikan dixe:**
- Henekên xwe pê dike.

**Ji serê wî zêde ye:**
- Ji wî pir baştir e; ne mirovekî biqîmet e.

**Ji serê wî û heftê bavê wî zêde ye:**
- Bi heman wateyê.

**Kêrvoşik û devlok:**
- Dema kesên belengaz carekê ziyanê didin hina hingê tê gotin. (Devlok: Gotinguhêz)

**Kêzê jî hat rêzê:**
- Wî jî xwe xist nav navan; wî jî xwe tiştek hesab kir.
(Dema yek ne li gorî hina be lê xwe bixe nava wan, yan jî ji pîşeyekî fêm neke lê çawa ku bizane xwe dide pêş hingê jê re tê gotin)

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## Pêwîst e banga Rêber Apo li hewa nemîne



Ev nêzî 52 sal in têkoşîneke mezin ji bo azadiya doza Kurd tê meşandin. Beriya Tevgera Azadiyê jî gelek serhildan û hewildanên ji bo dozê hatin kirin. Ji Seyid Rizayan heya Şêx Seîdan, Qazî Mihemedan heya Zerîfe Besê û Elîşêran, pir pêşeng derketin. Li hemberî wê jî gelek komkujî, qirkirin, tunekirin û pişaftin li dijî gelê Kurd pêk hatin.**R-5**

## 'PKK'ê mîras e û mîras nayê windakirin'

**Birayê du şehîdên PKK'ê şehîd Rîhan û Kerîm, Hesen Tahir diyar kir ku PKK'ê di rewşeke ku tekneolojî û komplo tê de li pêşe derket, lewra barê wê girantir bû û berxwedana wê jî mezintir bû.R-4**



Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1280 | 11-Pûşper-2025 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S

## Piştî hilweşandina rêjîma Baas Sûriye di nav aloziyeke mezintir de dijî



Rêjîma Baas ku 61 salan li ser desthilatdariyê bû, bi plan û hewildanên hêzên derve hat hilweşandin. HTŞ'a ku bi destê hêzên derve hat ser desthilatdariyê rewşa Sûriyê xirabtir kir û gelek hêzên ku ji vê rewşê sûdê werdigrin, HTŞ'ê ji bo berjewendiyên xwe bi kar tînin.**R-3**

## 'Pêwîst e dagirkerî bi dawî bibe'



Koçberên Efrînê û Serêkaniyê diyar kirin ku piştî ketina Rêjîma Baas û hatina desthilatdariya Şamê, li herêmên mîna Efrîn, Serêkaniyê û Girê Spî dagirkerî berdewam e û gotin, "Pêwîst e hêzên navdewletî bi awayekî lezgîn bi erkên xwe rabin û dagirkirina axa Sûriyê bi dawî bibe."**R-6**

# RÊBER APO: PROJE TEMAM BÛYE, TIŞTA DIMÎNE PÊKANÎN E

Rêber Abdullah Ocalan ji bo qada Jineolojî nameyek û şaxek ji çîçekekê ku di hewşa girtîgeha Îmraliyê de şîn bibû; şandiye. Rêbertî di wê nameyê de wiha gotiye: "Ev xebata min êdî temam bûye û tişta dimîne pêkanîna wê ye. Ez dizanim ku wê jin pêşengiya Pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk ya ku em hewl didin pêş bixin, bikin."**R-2**



## Ji çiraxên wêjeya Kurdî

Helbestvan Elî Çilaxa çiraxek geş li asîmanê wêjeya Kurdî ye. Helbestvan û nivîskarên Kurd ên hevdem di parastina nirxên miletê Kurd de û parastina mîrateya çandî, nasnameya neteweyî û zimanê Kurdî de roleke girîng lîstine, rola wan ne kêmtir e ji rola têkoşîna şervanan di eniyên şeran de.**R-7**




Kevneşopiyên ku jinê diwestînin
Nehîr pale R-2


Bersiva pirsê, Xweserî û QSD'ê misogeriya Sûriyê ne!
Dilyar Cizîrî R-4


Rojnameya Serxwebûn a Yekem
Farûk Sakik R-5


Tirkiyê; ji bo HTŞ û DAIŞ'ê belê, ji QSD û Kurdan re na!
Zekî Bedran R-5


Cejneke Nû, Jiyaneke Nû!
Rohat Bulut R-6

# Rêber Apo ji bo Jîneolojiyê name şand: Proje temam bûye, tişta dimîne pêkanîn e

Rêber Abdullah Ocalan ji bo qada Jineolojî nameyek û şaxek ji çîçekekê ku di hewşa girtîgeha Îmraliyê de şîn bibû; şandiye. Rêbertî di wê nameyê de wiha gotiye, "Ev xebata min êdî temam bûye û tişta dimîne pêkanîna wê ye".

**Navenda Nûçeyan**

**Name wiha ye:**

"Min ji zarokatiya xwe ve hewl da ku ez bibim heval û rêhevalê jinê yê herî baş. Di têkiliya min û dayîka min de jî, lêgerîna min a ji bo jina azad dikare were dîtin. Ez girêdayî xeyalên xwe yên zarokatiyê mam, bi wî rengî min jiyan kir û têkoşîna azadiya jinê derxist holê.

Dema ez nû anîm Girava Îmraliyê min gotibû; "Xebata min a derbarê jinê de projeyeke ku nîvçe maye ye". Ev xebata min êdî temam bûye û tişta dimîne pêkanîna wê ye. Têkoşîna azadiya jinê mîrateyeke gelekî girîng afirandiye. Ev mîrate bi dayîna hezaran şehîdan heta roja îro hat û nirxek girîng ava kir. Pêwîste bê zanîn ku min her tim xwest jin bijîn û ew bên jiyandin. Her windahiyek wan her tim ez êşandime. Ji bo min gotin, "Ew kurê xwedawendê ye". Min jî xwest ez bibim kurekî (zarokekî) hêjayî jinan. Vê yekê rêgeza (hêmana) bingehîn a têkoşîna min diyar kiriye. Min ji bo jinan, "Rêgeza Hêviyê" pêş xist. Min got, "Pêwîste her jinek azad bibe". Wekî mêrekê min jî bi pîvanên etîk û estetîk ên li gorî azadiyê şekil girtine, xwe terbiye kir.

Min got, "Rêgeza bingehîn a Sosyalîzmê azadiya jinê ye".

Pîvana mêrekî ya sosyalîstbûnê jî ew e ku zanibe li gel jinê bi awayekî rast bijî. Ev rêgeza bingehîn a Sosyalîzmê ye. Di tecrubeyên sosyalîst ên di tevahiya dîrokê hatine jiyankirin de ev rêgez her tim kêm maye. Ji Marks heta Stalîn, ji Mao heta Lenîn, eger pêwendiya tevahiya rêberên pêşeng a bi jinan re were lêkolînkirin, wê ev heqîqet hîn baştir were fêmkirin.

Projeya min a nîvçe maye, bi Jîneolojiyê re jî meşiya. Min xwest bi vê teorî û têgehê pirsgirêka jinê rast pênase bikim. Wekî ku Budha gotiye; "Heta ku tu xençera di pişta civakê de dernexînî, tu nikarî qet tiştekî bikî". Belê, gelek pirsgirêkên civakê hene, lê xencera di piştê de koletiya jinê ye û heta ku tu vê xencerê dernexînî, tu nikarî ti pirsgirêkan çareser bikî.

Jîneolojiyê bi vê mebestê rêyek girîng derbas kiriye. Kedeke bi nirx hatiye dayîn. Niha pêwîste ev ked, bi pêvajoya nû re hîn zêdetir wateyê qezenç bike. Pêwîste hebûna jinê rast were pênasekirin û nasname û hebûna jinê bi rêbaza wekhevîbûnê bê nirxandin.

Sîmon dibêje ya; "Wekî jin nayê dinê, dibe jin". Pêwîste nasnameya jinê ya ku hatiya avakirin ji hêmanên zayendîperest were paqijkirin. Divê jin ji bo vê yekê lêhûrbûn bikin. Eynî wekî ku V. Woolf gotiye; divê odeyek aydê jinê bi xwe hebe. Pêwîste derbarê xwe de bifikire û karibe xwe ava bike. Ez dizanim jinbûn çiqas zehmet e û bi vê zanebûnê viya dibêjim. Dema di bin çanda tecawîzê ya zilam de jiyan dike, bi awayekî azad xwe avakirin, ji bo jinê zehmet e. Lê jin vê rastiya şewitîner qasî min bi êşkişandinê, bi hêrsbûnê hîs dikin yan na, ez nizanim. Ez bi vê hêrsbûnê her roj bi awayekî fikrî xwe nû dikim, çareseriyê hildiberînim û ji bo ku jin bi awayekî azad bijî, dijîm. Wateya jiyanê li cem min bi vî rengî rasteqîniyê qezenç dike.



Tê gotin ku femînîst dibêjin çima mêrek pêşengiya tevgera jin a Kurd dike. Mafdar in, xweziya jinan karîbûya ev pêşengî bikiraya. Min jî ev gelekî dixwest. Mixabin li derveyî tevgera Kurd jî, bi giştî jî hîn ev pêşengtî derneketiye holê. Min her tim got, divê jina azad çawa be û ji bo wê proje, teorî çêkirin; min bîrdoziya azadiya jinê û Jîneolojî pêş xist, min ev gihad hêza rêxistinbûnê. Min ji bo veguherandina mêr û bi rêya jinê azadkirina civakê hewldan kir, xebat meşand. Ji bo ku bibim zarokekî hêjayî xwedawendan, min ev yek kiriye. Ez bendewarim ku min bi vê rastiya min, bi awayekî rast fêm bikin.

Ez dizanim ku wê jin pêşengiya pêvajoya "Aştî û demokrasiye" ya ku em hewl didin pêş bixin, bikin. Ew xwediyên ji nîviyê zêdetirî serkeftinên ku heta niha hatine bidestxistin in. Bawer dikim ku wê ji niha û pê de jî pêşengiyê bikin û dibêjim ku ji niha û pê de jî, ez ê her tim qasî ku hun pêdivî dibînin bi we re bijîm û bi we re bim."

## Ji Pênûsa Jin

### Kevneşopiyên ku jinê diweştînin

**Nehîr Pale**

Di navbera du rojan de min derdora 20 jinên ku hevjînê wan wefat bûye, dîtin. Rûyê her yekê ji wan mîna tabloyên xumamî, çav melûl û sîmeyên gelekî weştiyayî bûn. Mêr, çi birayên hevjînên wê, yan jî zarokên wan li derdora wan jinan bûn. Mîna ku dev ji hemû karê xwe berdane û bi wan jinan ketine. Jinên hevjînên wan mirine sûc nekirine ku li ser serê wan nobedar bin. Rêbazên ku bi wan re didin bikar anîn mîna ku ev jin li ser serê wan bûne bar, divê namûs û şerefa jinên mêrê wan wefatkirine, biparêz in. Ev hemû jî di bin navê kevneşopiyan de tê kirin.

Ev çi kevneşopî ye ku lawikê 10 salî parastina jineke hevjînê wê miriye, bike. Hemû jinên min ew dîtin temenên wan ji 20 û jor ve bû, xwedî zarok in û tecrûbeyên wan hene, lê li gorî kevneşopiyan ev jin nikarin xwe biparêzin, lawikê 10 salî namûs û şerefa wê û malbatê diparêz e.

Tişta balkêş jî di hemû rewşan de jin tê sûcdar kirin û kesek newêrê ku kevneşopiyên dûrî edaletê lêpirsîn bike. Hinek jinên xwedî zarok ku piştî wefata hevjînên xwe careke dîtir zewicîne li ber çavê zarokên wê û civakê reş dikin. Ji civaka cinsiyetparêz kesek napirse çima ew dayîk li gel zarokên xwe nemaye û careke dîtir zewicî ye. Ji ber vê yekê ez ê balê bikşînim ser kevneşopiyeke dîtir. Jina hevjînê wê wefatkiriye jêre dibêjin`Jinebî` eger temenê wê biçûk an mezin be ew neçare bi mêrekî dîtir re were girêdan. Li gorî kevneşopiyan eger ew li gel zarokên xwe bimîne divê bi birayê hevjînê xwe re bizewicê yan jî yê malbata wê (bav, bira û apan) bi zorê wê ji zarokên wê dûrbixîn in û vegerînin malê careke dîtir bizewcîn in.

Di hemû rewşan de kêmanî dikin a jinê û wê sedema hemû pirsgirêkên civakî dibîn in. Şaxên vê zîhniyetê gelekî kûr çûne, di kevneşopî, rêbaz, ziman û her tiştê civakê de diyar dibe. Jin temenê wê çiqas be yan jî kî be ji vê zîhniyetê xilas nabe. Berevejî dibin qurbanê vê zîhniyetê û heyanî saxin divê xizmeta vê zîhniyetê bikin û xwe jêre isbat bikin. Jina hevjînê wê wefatkiriye mîna pariyekî hemû mêr dixwazin wê biqurpîn in. Bi weştandin û fedakariyeke mezin zarokên xwe bi tena xwe xwedî dikin, ne malbata wan ne jî malbata hevjînê wan pêre dibin alîkar. Yên derdora wê jê napirsin ku ew ê pere ji kudere bîne û zarokên xwe xwedî bike, berevajî li ser serê wê û zarokên wê ne. Eger lawikên wan hebin piçekî zexta civakê li ser wan sivik dibe, lê tenê keç bin dayîk û keçên xwe heyanî saxin ew ê di bin rehmeta mêr û kevneşopiyan de bin.

Duh wexta min cejin li wan dayîkan pîroz dikir mîna ez ji miriyan re bibêjim cejna we pîroz be, bi dengekî nizm bertek ji wan derdiket. Her çavên wan li mêrên nobedar û celad ên li ser serê wan in, bû. Gelekî bi baldar tevdigeriyan da ku zeyîfatiyeke wan negrin. Min dema ev yek didît min hîsdikir ew dayîk di cehenemeke heft tebeqeyî de dimîn in.

# Rêjîma Îranê kuştina jinan rawe dibîne

**Dîlan Mulhim\Qamişlo**

**Li Rojhilata Navîn û bi taybet li Îranê rojane jin rastî kuştin, destdirêjî, revandin û tundiyê tên. Li gorî raporên rêxistinên mirovî, tenê di Nîsana bûrî de li Îranê 12 sûcên kuştina jinan û 12 bûyerên xwekuştina jinan rû dane.**

Li Rojhilatê Kurdistanê û Îranê di dema dawî de kuştina jinan zêdebûye. Li gorî Rêxistina Mafê Mirovan a Kurdistanê, di Nîsana 2025'an de li Rojhilatê Kurdistanê 12 jin ji aliyê mêran ve hatine qetilkirin. Herwiha 12 jin bi awayekê bi guman xwekuştine.

Li gorî Rêxistina Mafên Mirovan a Kurdistanê di sala 2024'an de li Rojhilatê Kurdistanê 47 jinên Kurd ji aliyê mêran ve hatine qetilkirin û 97 jin jî bi awayekê bi guman jiyana xwe ji dest dane. Li hemberî van kiryarên dijmirovî ku li dijî jinan tên meşand li Rojhilatê Kurdistanê, ji aliyê saziyên mafê mirovan û hêzên navdewletî ve tu bertek nehatine nîşandan. Bêdengiya navdewletî rê



li ber kuştina jinan vedike, herwiha pêwîst e hêzên navdewletî û bi taybet saziyên ku mafê jin diparêzin bi erkê xwe rabin.

### Rêjîma Îranê xwe li ser bingeha tunekirina jinê ava kiriye

Rêjîma Îranê di dîroka xwe ya demdirêj de heya roja me ya îro siyaseta xwe ya darvekirinê bi her şêweyî li hemberî çalekvanan dewam dike. Ji xwe tê zanîn pergala rêjîma desthilatdar ya Îranê li ser bingeha tunekirina jinê hatiye avakirin, ew bi zihniyeta zilamê serdest zagonan didine avakirin. Di heman demê de hijmareke mezin ji mirovan hatin bi darvekirin û bi taybet jin. Di roja me de jî gelek mînakên ber bi çav hene ku Jîna Emînî dixwest bi nasnameye Jintiyê û di heman demê de bi cil û bergên xwe yên resen xwe bide pêş, lê ev bû sedem ku rejîma Îranê ji bona domadina pergala xwe xeteriyek mezin bibîne.

### Li Rojhilatê Kurdistanê cezayên darvekirinê li ser jinan tên ferzkirin

Hişmendiya baviksalyarî û sîstemên hegemonîk naxwazin ku sedsala 21`ê bibe sedsala azadiya jin, bêhitir êriş û qirkirina xwe li ser jinan zêde dikin. Li Rojhilatê Kurdistanê û bi taybet li Îranê rojan e jin rastî kuştin, destdirêjî, revandin û tundiyê tê, herwiha divê dema dawî de hejmareke ji jinan li ser destê mêr tên qetilkirin. Di heman demê de cezayên darvekirinê heta roja îro li Rojhilatê kurdistanê li ser jinan tê meşandin. Ji ber ku naxwazin hêza jinê xurtbibe, desthilatdariya rêjîma Îranê bi birîna cezayên darvekirinê li ser kesayetên pêşeng, rojnameger, siyasetmedar û yên bi bandor di civakê de. Tirsa serîrakirina li hember rejîmê dide avakirin, bi taybet ev siyaset li ser gel û jinên Kurd bi tundî tê meşandin.

Herwiha Hêzên dijberî jin û doza wan çalakvan, xebatkarên civakî, siyasî, rêveberî û aborî dikin hedef. Armanca wan tunekirina îradeya jinê ye.

### Serhildana "Jin, Jiyan, Azadî" li hemû qadên têkoşînê bilind bûye

Jinan di têkoşîna ji bo mafên xwe û civakê de berdêlên giran dan û jiyana xwe ji dest dan, hatin girtin, bi cezayê darvekirinê re rû bi rû man, lê tu car dev ji têkoşînê bernedan. Serhildana "Jin, Jiyan, Azadî" ya li hemû qadên têkoşînê bilind bû, sînor derbas kirin û bû banga yekîtiyê. Ev sekna jinan, nîşaneya têkiliya di navbera aqilê hevpar û zanînê, axê, gel, azadî û wekheviyê de ye. Jin bi zanistî û hişmendiya kolektîf, li hember polîtîkayên zextkar ên hêzên hegemonîk serî rakirine û vê zanabûna têkoşîna bi hêz avakirine. Li hember şerên parkirinê yên desthilatdaran, dem hatiye ku hemû jin, mêr û ciwan ji bo hevdîtinek di nava şoreşê de û hevgirtinê ava bikin.



# Ji çiraxên wêjeya Kurdî

**Can Yûsef**

Helbestvan Elî Çilaxa çiraxek geş li asîmanê wêjeya Kurdî ye. Helbestvan û nivîskarên Kurd ên hevdem di parastina nirxên miletê Kurd de û parastina mîrateya çandî, nasnameya neteweyî û zimanê Kurdî de roleke girîng lîstine, rola wan ne kêmtir e ji rola têkoşîna şervanan di eniyên şeran de.Wêjeya Kurdî navgîneke berxwedanek aştiyane û çandî avakir, bû amûrek belgekirinê ji bo bîrdanka gelemperî û zindîkirina nirxên neteweyî di rûyê hewildanên pişaftin û tunekirinê de, herwiha Helbestvan û nivîskarên Kurd roleke girîng di parastina zimanê Kurdî de lehîstin li hemberê hewldanên qedexekirin û piştguhkirinê bi rêya nivîs û helbestên xwe bi zimanê dayîkê û wan helbesta kurdî ya nûjen kire rêbazeke teşwîqkirina berxwedanê û bangek ji bo girêdana bi erdê re, maf û nasname yê ve bimînin, wan di rêya kar û çalakiyên xwe, derdên neteweya kurd di aliyên xwe yên dîrokî, hestyarî û polîtîkî de diyarkirin .Helbestên wan naveroka azadiyê, redkirina dagirkeriyê û serhildana li dijî neheqiyê hildigirin û gelek caran vediguherînin sîrûdên şoreşgerîyê ku şervan distirînin.

Ne gengaze (mumkine) helbestvan û nivîskarên kurd ên hevdem ji projeya neteweyî ya Kurdî werin veqetandin, ew dengê netewê ne, bîrdanka jîyana wê ne û parêzvanên nasnameya wê ne, wan bi peyvan vehûnandin ku çek bi tena xwe ne dikarî wê îfade bikin û wan wêje kire li kêleka berxwedanê û navgînek ji bo avakirina neteweyek ku ji xwe re haydar be û bi israr be li ser jiyanek bi azadî û bi rûmet .

Helbestvan Elî Çilaxa yek ji van helbestvanên kurd ên hevdem e ku di parastin û pêşxistina mîrateya çandî û wêjeyî ya gelê kurd de, roleke bingehîn lehîste bi riya pabendiya xwe ya kûr bi zimanê kurdî ve û bikaranîna wî ji helbestê re mîna amûrekî ya têkoşîn û hişmendiya neteweyî. Helbestên wî dîrokek zindî ya cefayê kurdan û şepêlek xurt ya nasnameya neteweyî ava kiriye û bi rêya wan derbirîna derd û kulên gelê xwe kiriye û têkoşîna wî belgekiriye û dîroka wî zindî hiştiye di hemberî zordariyê û rolek lehîstiye ku zimanê kurdî di jiyanê de mayende bimîne û lêbide, wî wêje û berxwedan biheve girêdan, hişte ku ew bibe semboleke çandî û wêjeyî ya navdar di dîroka gelê kurd de.

Elî Çilaxa di sala 1969'an de ji dê û bavekî kurd (Remezan - Emîne) di nav malbateke kurdperwer a welatparêz û xebatkar de, evîndarê welat û girêdayî bi nirxên wî yê kurdewarî ve, li gundek yê kurdan li Rojavayê Kurdistanê gundê (Girkê Xelo) yê girêdayî navçeya Çilaxa ya herêma Dêrika Hemko hatiye dinyayê, herçiqas ku ev herêm bibû hêlîna kul û derdan û keleheka pêdarî û berxwedanê di demek ku navê Kurd di bin gefan re derbas dibû, zimanê wî dihate qedexekirin û dîroka wî ji holê dihate rakirin, ew li jîngehek gundî di nav malbatek neteweyî ya belengaz de mezin bû ku debara jiyana xwe li ser çandinî û sewaldanê diqedandin, di nav herêmek kurdî de ku wargehê çîrok û efsaneyan û di nav mirovên qenc de ku barê giran û rûmeta welat li ser milê xwe hildigire mezin bûye, ew di dîroka 29.10.1992 bi xanim Rismiya re zewiciye û ew bavê şeş zarokaye (du keç û çar kur), ew endamê komîteya herêmî ya Partiya Yekîtiya Demokrat a Kurd li Sûriyê (Yekîtî) û endamê Yekîtiya Nivîskarên Kurd li Sûriya yê û herwiha endamê Hevgirtina Rewşenbîrên Rojavayê Kurdistan û yek ji damezrênerên Rêxistina Mirovan a li Rojava, ku di sala 2013'an de hatiye damezrandin, herwiha yek ji damezrênerên Mîhrîcana Helbesta Kurdî, ku salane li ser xaka welat tê derxistin her wekî din roleke wî ya berbiçav heye wekî mamosteyek zimanê kurdî li herêma wî.

Ji zaroktiya xwe ve, ew li hember neheqiyê gelek hestiyar bû, ku nalîna xakê di dilê xwe de vedihûne û di xizaniya mirovan û bêparbûna wan de helbestên nediyar dibîne.

Di xortaniya xwe de, ewî nivîsên ronakbîrên Kurd ên sirgûnbûyîn û edebiyata helbestvanên kurdên mezin bû ên wek (Melayê Cizîrî - Ehmedê Xanî - Cegerxwîn û Seydayë Tîrêj ... hwd ) naskirin û ew gelekî bi birayê xwe yê mezin Hejar Elî bi bandor bû di fêrbûna zimanê kurdî de .Wî dest bi nivîsandina helbestên xwe yên pêşîn kir ku bi rengekî dizî dihatin belavkirin û an jê bi devikî dihatin vegotin, gotinên wî ne pêkan bûn, lê rasteqîn û germbûn, mîna dengê çekan û germahiya fêrmiskan cî digirtin Wî helbest dinivîsandin li ser gundên şewitî, li ser dayikên hêvîdar, li ser zimanê qedexekirî, li ser milîtanên şehîd ketîn bêyî ku yek xêzê ji wan re binivisîne, wî ne ji bircê mermer kirî dinivîsand, wî ji kûraniya kul û derdan ji nav girsên gel helbest dinivîsandin. Ji ber vê yekê ew hezkirî û guhdarkirî di her maleka Kurdî de ma .

Tevî astengiyan û darizandinan ji hêla rayedarên Sûrî ve, wî dev ji nivîsandinê berneda, gelek ji helbestên wî ne hatin weşandin heta piştî mirina wî, hin kesan jî heta navê wî yê rastî ne dizanîn, çimkî wî xwest ku li pişt dengê gelemperî xwe veşêre û wenda bibe, da ku bibe ziman ji bo kesên ku dengek wan tune, ew dijiya û mir jî wî her bawer dikir ku helbest dikare berxwedêr be, birînan derman bike û gel sor bike û rake ser piyan .

Wî qonaxa seretayî li gundê xwe (Girkê Xelo) xwend, piştre berê xwe da Çilaxa û li wir xwendina xwe ya amadeyî û lîse bi dawî kir û dûvre çû bajarê Helebê da ku xwendina xwe ya bilind biqedîne, li wir wî li zanîngeha Helebê kulîjeya mafnasî (Hiqûq) xwend û di sala 2010'an bi dawî kir û jê derçû û ew bû hêzek ji wî re da ku ramanê xwe yê mafnasî û mirovahî pêş bixe û hişt ku ew bibe hêzek bi bandor di nav civaka wî ya xwecihî de.

Meylên wî yên wêjeyî û çandî û hezkirina wî ya ji bo nivîsandinê û helbestê di yanzdeh saliya temenê wî de dest pê kir û di sala1980'an de dest bi kariyariya xwe ya wêjeyî (edebî) kir û dest bi nivîsandina helbestê bi zimanên Kurdî û Erebî kir, pîşeya wî ya wêjeyî tenê bi nivîsandina helbestan sînordar nema, lê wî gelek gotar, lêkolîn û çîrokên edebî nivîsandin, berhemên wî yên wêjeyî di warê helbestê, gotar, çîrok, roman û vekolînên wêjeyî de hene û ji berhemên wî yên edebî ên çapkirî du dîwanên helbestan bi zimanê kurdî hene :

1-Dîwana wî ya yekemîn (Arya) di sala 2021'an de hate weşandin.
2-Dîwana wî ya duyemîn (Heyas) di sala 2023'an de hate weşandin.

Herwiha di heman demê de du dîwanên wî bi zimanê Kurdî û du romanên wî bi zimanê Kurdî û bi zimanê Erebî hene, ji bilî bi dehan gotarên ku di rojname, pirtûk û kovarên wêjeyî û çandî û malperên medya civakî de hatine weşandin, wek (Kovara Nivîskar û rojnameya vedeng û Bûyer û yên din.).

Elî Çilaxa dihate nasîn bi zanebûna xwe ya berfireh û ramanên xwe yên ronakdêr û di civaka xwe de roleke wî ya navdar hebû, ji ber ku ew beşdarî çareserkirina gelek pirsgirêkên civakî û mirovahî dibû, herwiha ew beşdarî gelek festîval û ahengên wêjeyî û çandî li Rojavayê Kurdistanê



bûye, û wî gelek helbest û noşe li şevbuhêrkên helbestî û helkeftên neteweyî pêşkêşkirine. Di xebatên xwe yên edebî de, êşên gelê kurd, pirsgirêkên welat, kul û derdên gelê xwe û berxwedan, û lehengiya wê bi rêya helbest û gotinên xwe dianîn ser ziman.

Elî Cilaxa yek ji helbestvanên serdema nûjen tê hesibandin, wî hemû cûreyên helbestên kurdî (Kevneşop, Nûjen û Peşxan) bi şêwazek bedew nivîsîne, hişt ku bandorek erênî li ser şagirtên xwe bike, di rêya hest , raman û baweriyên xwe.

Elî Cilaxa ne tenê helbestvanek hestyarî bû, lê her weha dengek şoreşger bû, lê şoreşa wî ne bi hêlehêl bû, şoreşa wî rihet bû, mîna dilopên baranê hêdî hêdî dibare ku di zikê xakê de diçe xwarê û jiyanê diafirîne.

Di nav helbestên wî yên herî navdar ên ku ji kûrahiya hestyarî û neteweyî ve hatine diyar kirin evin :

1- Welatê Şêrîn
2-Gaziya Sînor
3- Çima
4- Komek kul
5-Herê Yarê

Herwiha wî gelek helbestên kilasîkî yên stranbêjiyê bi rêzbend û terazû nivîsandine ku ji hêla gelek hunermendên kurd ve hatine awazkirin û di albumên xwe de weşandine, ya herî navdar helbesta wî ya (Cejna sersalê) ku ji hêla hunermend Sulîman Hevok ve hatî çêkirin û strandin.

Mafnas û helbestvanê Kurd Elî Çilaxa di temenek zû, hîn di pêncî û du saliya buhara emrê xwe de koçê xwe ji jiyanê barkir û çû ser dilovaniya xwe, piştî ku mîrateyek wêjeyî, çandî û konevanî ya dewlemend li dû xwe hişt û di roja 28/1/2021'an bi sedema kirîza mejî wî jiyana xwe ji dest da li navçeya Çilaxa ya girêdayî herêma Dêrika Hemko, bi merasîmekî bi heybet hate oxir kirina, bi amedebûna girseyek mezin ji xelkê herêmê û ji rewşenbîr û kesayetiyên siyasî û civakî ve hate veşartin li bajarê wî, yê ku hertim jê hesdikir û di gelek helbestên xwe de pesnê evîna wê dida (Çilaxa), navê ku bi wî re hevrê jiyana wî bûyî û hatibû hez kirin û pê hatîbû naskirin, bajarê nemirde di wijdana wî de û bîrdanka xwendevanên wî de .

Bi çûna wî, qada çandî û wêjeyî ya Kurd dengek winda kir ku mîna pirekî bû di navbera kevneşop û nûjen de û di navbera zimanê peyvok û zimanê sembolîk de .

Helbestvan Elî Çilaxa bi laşê xwe oxir kir, lê ew bi giyanê xwe û bi wêjeya xwe sax ma, li dû xwe mîrateyek helbestî ya dewlemend ji edebiyata kurdî re hişt, ku bûye beşek girîng a bîrdanka çandî û edebî ya Kurdî. Helbestên wî ne gotin, ew dengê gel û fikarên welatin û ew hestên nasnameya Kurdî di rûyê hewildanên pijavtin û berzekirinê ne, helbestên wî di navbera wijdana neteweyî û dimîneya mirovî de ne, wî helbest veguhêrtê çeka berxwedan û parêzvanê nasnameyê. Helbestên wî heya roja îroyîn jî di navbera nifşan de têne bikaranîn û di pîrozbahiyan de têne xwendin û di edebiyat û rêbazan de têne nimûnekirin, ev yeke piştrast dike ku ew di wijdana kurdan de sembola ramanê, pêdarî û afirîneriya azad dimîne

Ji bo ruhê wî yê pak û paqij re rûmet û mandarî, ji bo mîrateya wî ya neteweyî, edebî û çandî mayende û domdarî.

# ‘Pêwîst e dagirkerî bi dawî bibe’

Koçberên Efrîn û Serêkaniyê diyar kirin ku piştî ketina Rêjîma Baas û hatina desthilatdariya Şamê, li herêmên mîna Efrîn, Serêkaniyê û Girê Spî dagirkerî berdewam e û gotin, “Pêwîst e hêzên navdewletî bi awayekî lezgîn bi erkên xwe rabin û dagirkirina axa Sûriyê bi dawî bibe."

**Dîyala Nîdal\Qamişlo**

Di sala 2018’an de ji aliyê dewleta Tirk a dagirker û çeteyên girêdayî wê ve bajarê Efrînê hate dagirkirin. Di encama dagîrkirina Efrînê de, bi sed hezaran welatiyên Kurd ên Efrînê şehîd, birîndar û koçber bûn. Di heman demê de, di 9’ê Cotmeha sala 2019’an de dewleta Tirk a dagirker bajarê Serêkaniyê û Girê Spî dagir kir. Di encamê de piraniya hemwelatiyên resen neçarî koçberiyê bûn, di heman demê de bi sedan kes hatin kuştin û revandin.

Piştî ketina Rêjîma Baas û hatina desthilatdariya Şamê, li herêmên dagirkirî bi taybet li Efrîn, Girê Spî û Serêkaniyê hîn jî dagirkerî berdewam e û welatî nikarin vegerin li ser cih û warê xwe. Herwiha di vê dema dawî de li ser vegera koçberan gelek nîqaş tên kirin. Derbarê mijarê de koçberên ji bajarê Efrîn û Serêkaniyê ji Rojnameya me re axivîn.

### ‘Li herêmên dagirkirî kiryarên dijmirovî berdewam in’

Koçberê ji Serêkaniyê û berpirsê Komîteya Têkiliyên Derve ya Koçberên Serêkaniyê Ciwan Îso da zanîn ku heta niha li herêmên mîna Efrîn, Serêkaniyê û Girê Spî dagirkerî berdewam e û wiha got: “Rewşa niha li herêmên dagirkirî tê jiyankirin weke rewşa berê ye, mîna berî ketina Rêjîma Baas e. Heta niha binpêkirin, revandin, kuştin û destdirêjî li herêmên dagirkirî berdewam dike. Li


Ciwan Îso

herêmên dagirkirî mafê mirovan winda ye û kesên li wan herêman bi tirs jiyan dikin. Herwiha çeteyên girêdayî dewleta Tirk a dagirker rojane kiryarên dijmirovî pêk tînin, milk û malên welatiyên resen yên Efrîn, Serêkaniyê û Girê Spî talan dikin. Ruxmî ku gelek malbat dixwazin ku vegerin li ser milk û malên xwe, lê ji aliyê çeteyan ve bac li ser wan tê ferzkirin. Heta niha li herêmên dagirkirî tu guhertin di aliyê hiqûqî, siyasî û mirovî de li ser rûyê erdê nehatiye çêkirin. Çeteyên dagirkeriya Tirk bi riya ragihandinê dibêjin ku rewşa wan herêman aram e û dibêjin bila welatî vegerin cih û warê xwe. Lê berovajî vê yekê em dibînin ku heta niha kiryarên dijmirovî berdewam dikin û rojane mirov tên revandin û kuştin.”

### ‘Pêwîst e saziyên mafê mirovan bi erkê xwe rabin’

Ciwan Îso anî ziman ku dewletên navnetewî dibêjin ku em dixwazin Sûriyeke demokratîk were avakirin, lê heta niha hin deverên Sûrî dagirkirî ne, bi vî rengî demokrasî pêk nayê û wiha pê de çû: “ Herêmên di bin serweriya dagirkeriya Tirk û çeteyên wê de mîna ku ne parçeyekê ji axa Sûriyê ne


Mehmûd Moso

û li wan hereman hemû kiryarên dijmirovî têne kirin, ev yek parçekirina axa Sûriyê pêk tîne. Ji bo rê li ber vê parçekirinê were girtin, pêwîst e çeteyên dewleta Tirk a dagirker xwe ji herêmên mîna Efrîn, Serêkaniyê û Girê Spî vekşînin û welatiyên resen yên wan herêman vegerin cih û warê xwe. Herwiha piştî katina Rêjîma Baas desthilatdariya Şamê bi armanca hevkariya hêzên navdewletî hate li ser desthilatdariyê, xewin û xeyala tevahiya gelê Sûriyê ew bû ku piştî ketina Rêjîma Baas Sûriyeke wekehev û Dîmokratîkî were avakirin, her kesî kêfxweşiya xwe ji bo vê yekê da xuyakirin. Lewma me jî kêfxweşiya xwe ji bo vê yekê anî ser ziman ku piştî ketina Rêjîma Baas em ê vegerin ser axa xwe. Em dizanin ku Rêveberiya Xweser û QSD’ê li ser dosyayên koçberan kar dikin. Di heman demê de pêwîst e ku dewletên navdewletî û mafên mirovan bi rola xwe rabin, rê li ber kuştin, revandin û destdirêjiyê bigirin.”

### ‘Pêwîst e dozên koçberan werin çareserkirin’

Ciwan Îso axaftina xwe wiha bi dawî kir: “Banga me ew ku desthilatdariya Şamê û hêzên navdewletî li ser doza vegera koçberan a bi ewle kar bikin. Da ku doza koçberan were çaresekirin, çeteyên girêdayî dewleta Tirk a dagirker ji wan herêman derkevin û welatiyên resen vegerin cih û warê xwe.”

### ‘Di dema dawî de gelek kes li Efrînê hatine girtin’

Koçberê ji Efrîn yê bi navê Mehmûd Moso jî wiha axivî: “Li herêmên dagirkirî û bi taybet li Efrînê gelek kes di vê dema dawî de ji aliyên çeteyên girêdayî dagirkeriya Tirkiyê ve tên girtin û revandin. Ev kes ku tên girtin bi hiceta ku girêdayî Rêveberiya Xweserin. Herwiha li herêma Efrînê heta niha kiryarên bê mirovî berdewam dikin û ev kiryarên bê mirovî li pêşiya çavên hêzên navdewletî tên kirin. Ruxmî vê yekê hêzên navdewletî û bi taybet mafên mirovan bê dengin.Em dibînin ku niha rewşa Sûriyê ber bi xirabûnê ve diçe, ji ber vê yekê divê ku dewletên navdewletî bi awayekî lezgîn destwerdan Sûrî bikin û dagirkerî bi dawî bibe.”

### ‘Em bi hêvî ne ku em vegerin cih û warê xwe’

Koçberê ji Efrînê bi navê Mehmûd Moso axaftina xwe wiha bi dawî kir: “Divê demê de behsa vegera koçberan li ser cih û warê wan tên kirin. Lê di aliyê piratîkî de tu gav ne hatine avêtin, hineke welatiyên Efrînê di vê dema dawî de vegerin li ser cih û warê xwe lê ne bi awayekî fermî. Ez bi hêvî me ku em bi ser bilindî vegerin cih û warê xwe. “

## Xwenasîn



### Cejneke Nû, Jiyaneke Nû!

**Rohat Bulut**

Her sala dema Cejna Qurbanê tê bi milyonan sewal tên serjêkirin. Ev kevneşopiya ku wekî îbadet û rîtueleke tevkariyê bê dîtin jî di heman demê de nîqaşên girîng ên exlaqî û ekolojîk jî bi xwe re tîne. Başe, gelo em dikarin Cejna Qurbanê ya ku qet sewal nayên serjêkirin xeyal bikin? Jê jî wêdetir: Gelo cejneke ku şopên jiyana bi xweza û aştiyê re li hev hatî lê xuya pêkan e?

Di xwezaya îbadetên qurbanan de parvekirin, çav li kesên xwedî pêdiviyan, terbiyekirina nefsê heye. Pêkanîna van nirxan bêyî ku xwîna sindîwarekî bê rijandin jî dikare bi cih bê. Mînakên wê jî hene.

Em dibînin gelek bawermendên demokratîk û wekhevîparêz ew aliyên sembolîk ên qurbanê derxistine pêş. Yanî kesên ku rewşa wan a madî ku baş be wekî wesfê mirovî neçare ku alîkariya kesên ku pêdiviya wan heye bike. Ev yek jî li gorî ruh û bi cih anîna şertên qurbanê ye. Li gorî min divê em di Cejnên Qurbanê de li gorî ruhê demê vê kevneşopiyê ji nû ve bifikirin. Sektora sewalkariyê, yek ji sedemên sereke yên pêşketina qeyrana avhewayê ye. Belavbûna gaza metanê, mizextina (Xerckirina) zêde ya avê ji pirsgirêkên serekene.

Bi taybetî jî di Cejnên Qurbanan de ev yek bi awayekî berbiçav xwe dide xuyakirin. Di Cejna Qurbanê de serjêkirina sewalan ne tenê bi dawîkirina mafê jiyanê yên sewalan e, di heman demê de dibe sedema xerabûna hevsengiya xwezayê jî.

Netenê ji bo mirovan, bi nêzîkatiyeke etîk û exlaqî, parastina mafê jiyanê yê hemû zindîwaran pêkan e. Em dikarin bi nêrîneke avakiran hevsengiya di navbera xweza û mirovan de û bêyî ku zirarekê bide zindîwaran bi hêzdarîkirina çanda tevkarî û alîkariyê li Cejna Qurbanê binêrin. Em dikarin tundiyê li sewalan nekin û bi kesên ku pêdiviya wan bi alîkariyê heye, nan, av û xwarina xwe bi wan re parve bikin.

Îro li tevahiya cîhanê şer, hilweşîn, qirkirin û bêedaletiyeke mezin heye. Mirov dikare jiyaneke bêyî şer, aştiyane û bi hev re jiyaneke wekî cejnê ava bike. Cejn dikare bibe sembola aştî, xweşik-biratî, parvekarî û jiyaneke bê xwîn. Bila xwîna sewalên qurbankirî neherikin, bila tovên mirovahî û merhametê aj bidin. Bila ne qêrîna sewalan, stranên mirovan deng vedin.

Jiyaneke nû pêkan e. Rêya avakirin û pêşvebirina jiyaneke nû bi merhamet û ekolojîkbûnê pêkan e. Di lêpirsîna hînbûn, bawerî û rîtuelên xwe de derbas dibe. Bêyî ku em serê sewalekê jê bikin jî em dikarin Cejna Qurbanê pîroz bikin, ev jî pêkan e. Ev di heman demê de rêzdariya li pêşberî xwe, xweza û sewalan îfade dike.

Di cejnan de ne dawîkirina jiyanekê, bi hev re pêşxistina jiyanê û bi hev re jiyîn watedar e. Ev nêrîn û nêzîkatî ji bo me û pêşerojê fersendeke. Nêzîkatî û feraseta me ya ji cejnê; divê cejneke bê qurbanî be. Divê em puxteya baweriyê, hevsengiya xwezayê û mafê jiyanê yê hemû zindîwaran biparêzin.

# Ji bo keda xwe pêşeroja xwe diyar dike

**Ayşa Silêman/ Dêrik**

**Bi saya Şoreşa Rojava jin bû pêşeng di civakê de û gelek destkeftiyên bi nirx bi dest xistin û karî cihê xwe di gelek qadan de bigre û gavên serkeftî bavêje.**

Yek ji destkeftî, kar û xebatên abûriya xweser yên girêdayî jinê, Firina Adar a ku di 4’ê Nîsana sala 2016’an de li bajarê Dêrikê ji hêla Kongira Star û aboriya jin ve hat vekirin bû. Ev firin ya nanê qalind û nanê sêlê ye, têde pênc kes kar



dikin, du jin nanê sêlê çêdikin û du jin û xortek nanê stûr çêdikin.

Di derbarê rewşa Firina Adar de Rêvebera Firina Adar Axîn Abdullah ji Rojnameya me re axivî.

### Rewşa Firina Adar

Axîn Abdullah anî ziman ku buhayê nanê firina Adar ji yê firinên din arzantire û wiha got: “li Firina Adar ji seat 5’ê sbehê dest bi çêkirina nan dike heya seat 12’ê nîvro. Nanê vê firinê ji bo tenduristiyê jî baş e ji ber ku arê wê yê esmere. Her meh em ardê xwe ji qamişlo tînin, lê wek din pêdiviyên din ên firinê em peyda dikin. Dema pirsgirêk di firnê de derdikevin jî em barê çeksazkirina wê radikin. Di heman demê de gelek xwaringeh siparîşê li ser nanê sêlê dikin û em destekê didin herderî çi xwaringeh çi jî kes bin. Armanc ji vekirina vê firinê ew bû ku alîkariyê bidin miletê xwe her wiha jinên ku zanebûna wan di vî milî de heye kar bikin da ku debara jiyana xwe bikin. Daxwaza me ew e ku her jineke ku pîşeyek di destê wê de heye dest bi kar bike û kesayeta xwe ava bike ji ber ku jin pêşenge û her cihê ku ew tevlî dibe bi coş kar û xebatê dide meşandin.”



# Piştî hilweşandina rêjîma Baas Sûriye di nav aloziyeke mezintir de dijî

Rêjîma Baas ku 61 salan li ser desthilatdariyê bû, bi plan û hewildanên hêzên derve hat hilweşandin. HTŞ'a ku bi destê hêzên derve hat ser desthilatdariyê rewşa Sûriyê xirabtir kir û gelek hêzên ku ji vê rewşê sûdê werdigrin, HTŞ'ê ji bo berjewendiyên xwe bi kar tînin.

**Amara Baran/ Qamişlo**

### Hilweşandina rejîma Baas serkeftina hêzên navnetewî bû

Rejîma Baa a ku 61 sal bû li ser desthilatdariya Sûriyê ma, di nav çend rojan de bi plan û hewildanên hêzên derva ji aliyê HTŞ’ê ve hat hilweşandin. Sedema zû hilweşandina Rejîma Baas, ew bû ku wê nekarîbû pêkhateyên li Sûriyê dijîn hembêz bikira, tenê di netewperestiyê de asê ma. Dengeyên siyasî yên Rojhilata Navîn jî bandor li ser hilweşandina rejîma Baas kir. Hatina desthilatdariya şamê jî bi wan dengeyan ve girêdayî ye. Dewletên netewperest yên ku yek ziman û yek netew hukim dikin şansê wan yên serkeftinê namîne, ji ber ku civaka Rojhilata Navîn nema dewletên ku bi yek zîhniyet tevdigerin, qebûl dike.

### Qetlîamên tên çêkirin Sûriyê ber bi demokrasiyê ve nabe

Sûriyê ku 14 salan di nav şer û aloziyan de bû, bi hatina HTŞ’ê re gelek nerezîbûn û bertek ji aliyê civaka Sûriyê ve li dijî wê derketin. Ji derve ve jî gelek bertek û nerazîbûn li dijî wê hene. Di hundirê Sûriyê de heta niha tu guhertin ji aliyê desthilatdariya Şamê ve nehatine çêkirin. Qetlîamên ku di Sûriyê de ji aliyê desthilatdariya Şamê ve tên kirin dewletê ber bi demokrasiyê ve nabe. Hêzên navnetewî li ser esasê berjewendiyên xwe tevdigerin, pir zêde îradeya civakê ji aliyê wan ve esas nayê girtin. Dewlet ji bo ku sîstemekê bide avakirin û civak wê qebûl bike, pêwîst e rast nêzê civakê bibe.

### Di destûra nû de mafê gelên Sûriyê hatiye binpêkirin

Ger dewletek nikaribe hevpeymana xwe ya civakî li gel civaka xwe çêbike, ew dewlet şansê xwe yê serkeftinê winda dike. Ji ber dewlet xwe li ser civakê ava dike. Dewleta Sûriyê ji bo ku aşitî pêk bîne pêwîst e di destpêkê de peymana civakî li gel civaka xwe bide çêkirin. HTŞ’ê di destûra nû de mafê gelên Sûriyê binpê dike, heta niha ji aliyê civaka Sûriyê ve ew nehatiye qebûlkirin, ji bo ku xwe bide qebûl kirin bi komkujî û gefan nêzê civakê dibe û bi rêya çapemeniya



xwe gefan li gelê Kurd û Elewî û Durziyan dixwe. Propagandayên ku tên kirin pirsgirêka Sûriyê çareser nake, ew şerê taybet ku bi rêya çapemeniyê tê meşandin, pir xeternake. Heta ku desthilatdariya Şamê yek ziman yek reng û yek netew esas bigre, wê pirsgirêka Sûriyê neyê çareserkirin û alozî her biçe kurtir bibe. Destûra nû a Sûriyê de mafê gelên Sûriyê hatiye binpêkirin û qetlîamên ku li ser durzî û elewiyan tê meşandin zehmetî di nav gelên Sûriyê de dide çêkirin, ew jî hîşt ku gel bê bawer nêz bibe, ji bo ku xwe bide qebûlkirin pêwîst e şêwazê tekoşîna xwe jî bide guhertin.

### Dewlet bi aştiyê dikare xwe rewa bike

Heta ku hêzên derve piştgiriyê bidin HTŞ’ê wê nikaribe xwe bi xwe rewa bibe û nikare bibe dewlet. Ger dewletek bixwaze ji civaka xwe re bibe dewlet pêwîst e aştiyê pêk bîne. Rejîma Baas jî ji Rûsya piştgirî digirt û gelek dewletê din jî li pişta wê bûn, lê di dawiyê de hat hilweşandin. Ger di hundirê civakê de şeriyeta dewletê nemîne ew dewlet rawabûna xwe winda dike. Bi ferzkirina yek reng û yek netew dihêle ku di civakê de nerazîbûneke pir mezin çêbibe. Ji bo HTŞ’ê demek dirêj lazime heta ku pirsgirêkan çareser bike, HTŞ’e niha difikire ku meseleyên aborî çareser bû, wek ku hertiştê wan çareser bûye. Lê herw çiqas meseleyên aborî çareser bibin jî, heta ku meseleyên civakî çareser nebin meseleyê aborî bê sûd dimînin. Ger di welatekî de îstîqrar nebe aborî pêş nakeve. Bê istiqrara siyasî istiqrara aborî çê nabe, heger desthilatdariya heyî bikaribe îstiqrarekî siyasî çêbike wî demê dikare îstîqrara aborî jî çêbike, herwiha wê bikaribe çembera ku ji aliyê hêzên netewî hatibû çêkirin, parçe bike.

### DAIŞ careke din xwe zindî dike

Piştê ku şoreş li Sûriyê dest pê kir, bertek û nerazîbûn ji aliyê civakê ve derketin. Ji 2012 heta 2013’an ve tiştek bi navê şoreşa Sûriyê nema, hêzên çekdarî yên bi navê îslamî û gelek tevgerên cîhadîst û dewletên herêmî ji bertekên civakê sûdwergirtin û di aloziya Sûriyê de cîh girtin. Di 2014’an de bi derketina DAIŞ’ê re hêzên navnetewî jî hebûna xwe di Sûriyê de rawa kirin. Tê dîtin ku DAÎŞ carekdin xwe di Sûriyê de zindî dike bi taybet li heremên weke Şam û Tedmir de xwe ji nûve ava dike û di nav hewildana erîşan de ye. Heta ku HTŞ’e li ser desthilatdariyê be, di Sûriyê de ewlekariyeke pir xort wê tune be. Edî rewşa heyî ji bin kontrolaa HTŞ’ê derdikeve.

### Sûriyê ber bi xirabûnê ve diçe

Rewşa Sûriyê ne rewşekî ku pir rihet bê çareserkirin û niha jî ber bi xirabûyîne ve diçe, gelek aliyên ku sûdê ji wê rewşê dibînin hene, herkes dixwaze li gor xwe Sûriyê bikar bîne, tiştên ku îro tên kirin ne di xizmeta gelên Sûriyê de ye, hemû pêkhateyên Sûriyê cîhê xwe di vê rêveberiyê de nabînin. Çawa dewletek biçûk li Idlîbê hat avakirin niha desthilat dixwaze ku li seranserî sûriyê xwe serwer bike, mijara wê ne sazîbûn û bi civakê ve girêdayî ne ku daxwazê civakê pêk bîne, ew desthilatdariya xwe bi darê zorê daye meşandine. Komkujiyên îro li ser Sûriyê û civaka Durzî û elewî tên meşandin li ber çavane, metirsiyê gelên durzî, elewî û Kurd heye. Ji bo derbaskirina rewşê pêwîstî bi tekoşînekê heye. Gelek hevdîtinên desthilatdariya Şamê bi hêzên derva re jî hatin çêkirin, ama bingehek nehatiye avakirin. Li ser wî bingehê daxwazê gel pêk nayîne, gelê Sûriyê salên dirêjin ku ji desthilatdariya rejîma Baas û heta niha bi gelek êş û qetlîaman re rû bi rû ne. Heta ku ew nakokî hebin, kirîza Sûriye çareser nabe, pirsgirêkên netewperestî wê Sûriyê ber bi parçebûyîn û aloziyên pir cîdî ve bibe.

### Pêwîstiya Sûriyê bi modela Rêveberiya Xweser heye

Rêveberiya Xweser di nav 14’e salan de rûxmê hemû êrîşan, bûye hêvî ji tevahiya gelê Sûriyê re. Ewlekariya Bakûr û Rojhilatê Sûriyê tevahî netewan Kurd, Ereb, Sûryan û Tirkmenan hembêz dike. Rûxmê ku êrîş ji 2011’an ve heta niha hem ji aliyê siyasî ve hem jî ji aliyê leşkerî ve nehatine seknandin, berxwedana gelê Rojava û avakirina sîstema demokratîk a di hûndirê Bakûr û Rojhilatê Sûriyê de bûye modêl ji bo herkesî. Herkes daxwaz dike ku Sûriye jî li ser vî esasî xwe ava bike û pirsgirêka xwe çareser bike. Sîstemek ku li ser netewperestî û dînperestiyê bê avakirin emrê xwe ne dirêje wê zû hilweşe û li hember civakê nekaribe berxwe bide civak xwedî taybetbendiyek ku pir netew, çand û dîn tê de hene ye, di rojhilata navîn de pir çand hene, di sûriyê bi xwe da jî gelek çand hene ji bo wî jî sîstema nenavendî ku mînaka wî Rêveberiya Xwesere ji bo sûriyê û tevahiya gelê sûriyê lazime. Rêveberiya xweser tecrûbeya xwe ya siyasî, Dîplomasî, Xweparsinê heye rûxmê hemû êrîşan jî sîstema xwe parast. Desthilata Şamê ger wî neke wê gelek zehmetiyan re rû bi rû bimîne wê nikaribe civakê jî rêve bibe.

### Banga dîrokî a Rêber Apo bandora xwe li ser Rojava kir

Banga Rêber Apo li ser Rojava û pirsgirêka kurd bi giştî bandora xwe kir. modêla ku îro li rojava tê meşandin li ser felsefa netewa demokratîk a Rêber Apo ye, ger ku îro hemû gel cem hevdû jiyan dikin û xweseriya demokratîk û sîstema demokratîk hatibe avakirin li ser felsefeya netewa demokratîk hatiye avakirin ji bo wî jî her bangawaziyên Rêber Apo wê bandora xwe li ser rojava dike. Bangawaziya Rêber Apo a ku di 27’ê Sibatê de kir hem bandorekî cîhanî bi xwe ra da çêkirin hem jî bandorekî li ser hêzên kurdistanî û navnetewî kir. Rêber Apo şêwazekî nû a tekoşînê derxist pêş, şêwaza aşitî û civaka demokratîk derxist holê. Li giştî cihanê de bangawaziya Rêber Apo bangawaziyekî dîrokî ye ku pişta xwe dide rêxistinkirina civaka demokratîk e.

### Ji bo sosyalîzma Demokratîk tekoşîn pêwîst e

Rêber Apo di xala yekemîn de dide dîyarkirin ku şêwazê tekoşîn û rêxistinkirinê bê gûhertin. Ji bo ku civak xwe bighîne sosyalîzma demokratîk pêwîstî bi tekoşîneke aştiyane a civaka demokratîk heye. Tenê bi çek rakirinê xwe gîhandina sosyalîzmê çênabe. Rêal sosyalîzîm jî 30 mîlyon şehîd da lê di dawiyê de sîstemeke dîktator pêş xist ew jî tê wateya ku tenê bi hêza çekê û bi tevgera leşkerî nikarî bigîhîjî hedefa ku tu dixwazî. Ji bo wî jî Rêber Apo pêwîstî dît ku şêwazê tekoşînê biguhere ku stratejiyekî li ser esasê rêxistinkirina civakê were çêkirin. Rêber Apo dibê je ku di bingeha tekoşîna min de komîn û civakbûyîn heye, di bingeha kapîtalîzmê de ferdiyet, Real sosyalîzmê de çînitî heye.

Tevgera azadiyê gelê kurd ji nûve zindî kir

Nirxên ku tevgera azadiyê çêkiriye li ser wan nirxan pêwîstî bi gav avêtinekî nû heye. Nirxên ku tevgera azadiyê ji bo civaka kurd avakir, gelê kurd ji nû ve zîndîkir, tecrûbê siyasî, civakî û çanda civaka kurd pêşxist û çanda demokratîk û tecrûbeyên leşkerî yên xwe parastinê pêş xist ew jî bi saya hezaran şehîdan bû. Dema ku Rêber Apo dibêje şewazê partiyê bigûherin nay mena ku dev ji wan nirxan berdin. Niha gelek propaganda li dijî tevgera azadiyê çêdibin ku dibêjin PKK xwe fesihkir wek ku dev ji hertiştê berdaye civaka me pêwîste li hember wan propagandaya hişyar be ney leyîstokan. Rêber Apo got ku “ PKK ‘e dema xwe tijekir pêwîste şewazê tekoşîna xwe nû bike û li ser nirxin ku tevgera azadiyê avakiriye xwe li ser wan nirxan mezin bikin.

Tevgera azadiyê bê rawestan 52 sal rûxmê hemû- zehmetiyan û şahadetan jî bi fedakarî û bi tekoşîn kir. Ew jî hîşt ku civak xwe ji nûve zîndî bike civaka kurd çavê xwe bi tevgera azadiyê re vekir. Pêwîstiya civakê bi azadiyê heye, desthilat û dewleta heyî dijminê azadiyê ye.

# ‘PKK’ê mîras e û mîras nayê windakirin’

**Birayê du şehîdên PKK'ê şehîd Rîhan û Kerîm, Hesen Tahir diyar kir ku PKK'ê di rewşeke ku tekneolojî û komplo tê de li pêşe derket, lewra barê wê girantir bû û berxwedana wê jî mezintir bû. Lê PKK'ê ne tenê gelê kurd parast, hebûna mirovahiyê domand û guhertinên dîrokî di Kurdistan, Rojhilatan Navîn û cîhan de pêk anî.**

**Ronahî Sadûn/Qamişlo**



Derbarê têkoşîna PKK’ê û rola wê di çareserkirina pirsgirêka Kurd de, yek ji welatparêzên Kurd û birayê du şehîdên PKK’ê şehîd Rîhan û Kerîm, Hesen Tahir bersiva pirsên Rojnameye me da û hevpeyvîn wiha bû:

**Hûn weke malbateke welatparêz, girîngiya derketina PKK’ê ji bo gelê Kurd û azadîxwazan çawa dinirxînin?**

Tevî ku beriya PKK’ê gelek tevger û partiyên Kurdî derketin. Lê malbata me bi tu partiyan re nebû alîgir û tevlî tu partiyan nebû. Herwiha mejiyê malbatê beriya PKK’ê ji hemû tevgerên Kurdî zelal û saf bû. Em amadebûn ji bo hatina PKK’ê û li benda fikrekî wekî PKK’ê bûn, lewra dema ku PKK’ê derket dîrek malbat cihê xwe di nav de girt. Di sala 1983’an de min weke kes bi PKK’ê bihîst ku tişekî nû tê ziman ew jî PKK’ê ye, agahiyên min li ser tunebû ku ew Partiya Karkerên Kurdistane, lê di rêya xweşk û birayê xwe yên şehîd de Rîhan û Kerîm min PKK’ê nas kir û min ev yek li ser wê got; “Eger xebatek ji bo gelê Kurd were kirin, encex di rêya vê partiyê be.” Ji ber ku beriya PKK’ê min li ser gelek partiyan xwendibû, lê dîroka PKK’ê dîrokeke cûda û pir bi wate ye. Partiya Karkerên Kurdistan a yekemîn ku karîbû pirsgirêkan ji hev cûda bike û di vê pêvajoyê de bi awayekî dirist bimeşe, ya girîng jî ew li gorî xwesteka gel bû. Em ji PKK’ê fêrî gelek tiştan bûn, gelek caran me weke gel digot; gerek wisa bibe, PKK’ê insyatîf dikir û eyîn wê dikir beyî ku em jêr re bêjin, ev jî encama dirstbûn û zanebûna wê bû.

**Tevlîbûna xweşik û birayê te yên şehîd Rîhan û Kerîm di nava PKK’ê de û xebatên wan yên siyasî bi çi rengî bû?**

Dema ku tevgera PKK’ê derbasî Rojava bû, mala me ji wan malên destpêkê ku bûn dilsozê wê. Birayê min hizra PKK’ê derbasî malbatê kir. Herwiha ew di sala 1986’an de li Ekadimiya Mehsûm Korkmaz li ser destê Rêber Apo perwerde dît û nêzî 7 salan xebatên siyasî li Rojava da meşandin. Di heman demê de ew di sala 1989’an de tevlî nava PKK’ê bû û sala 1992’an de li Serhedê bi çekên kîmyasalê şehîd bû. Xweşka min jî di sala 1988’an de xebatên siyasî da meşandin, nêzî salekê jî li Şamê li gel Rêber Apo ma. Piştre di sala 1990’î de tevlî PKK’ê bû û di 1993’an de şehîd bû. Rojava gavên tewrî yên mezin ji bo PKK’ê avêtin.

**Tu weke kesayet naskirina te ji Rêber Apo re û dîtina Rêber Apo bandoreke çawa li ser te kir?**

Bû şens ji min re ku ez di sala 1994’an de Rêber Apo bibînim. Dîtina Rêber Apo moralekî mezin bi min re çê kir. Herwiha dîtina Rêber Apo bi xwe jî şoreşek bû. Di heman demê de hemû pirsên ku di serê min de hebûn, Rêber Apo bi zelalî ew pirs bi encam dan.

**Rêber Apo PKK’ê bi zanebûneke çawa ava kir, herwiha girêdana PKK bi gel re û girêdana gel bi PKK’ê re di çi astê de ye?**

Rêber Apo tevgera PKK’ê bi zanbûn û zanisteke mezin ava kir, ji wan re diyar kir ku divê ew di nava gel de bin û pirsgirêkên gel çareser bikin. Rêber Apo dema kadroyên tevgerê perwerde dikir ji wan re digot; “Gel deryaye û win masî ne, divê win ji nava deryaya gel dernekevin, heger hun derkevin hunê bimirin.” PKK’ê li ser xwîna şehîdan hate avakirin. Herwiha di demekê de hat avakirin ku dewleta Tirk gotibû me gelê Kurd hemû xistine şikefta de û me li ser wan baton kiriye, mesleya Kurdî li cem me nema, wê demê PKK’ê ser xwe hilda û got; “Ez heme.” PKK’ê ji her tiştî mezintre û wê ne tenê di nava gelê Kurd de rola xwe lîst, lê belê li ser asta Kurdistanê û Rojhilata Navîn xwedî rol bû. Gelek şoreşên di cîhanê de me dît lê wekî PKK’ê dernekeṫiye û derketineke weke wê jî dûbare nabe. Herwiha me baweriya xwe hemû bi PKK’ê anî. Ji ber em bawer bûn ku ew ê xebatekî binirx ji bo gelê Kurd bike û hîn jî dike. Bi rêya PKK’ê gel zane bû. PKK’ê gelek şoreş di nava şoreşekê de didan meşandin û hemû beşê civakê girt nav xwe mîna; siyas, aborî, çandî, hunerî, leşkerî û hwd…

Pêvajoya ku PKK’ê tê de derket, çawa bû?

PKK’ê di rewşeke ku ilmaniyet, têknolojiya û komplo tê de li pêşe derket, di rewşeke ku sosyalîzama navdewletî çû tunebûnê hat. PKK’ê di vê qonaxê de derket, lewra barê wê girantir bû û berxwedana wê jî mezintir bû. Herwiha heya dema derketina PKK’ê jî kes li gelê Kurd nebû xwedî, berovajî wê hemû cîhan li ser tunebûna gelê Kurd bibûn yek, ji bo wê li hemberî vê yekê PKK’ê qehremantiyeke mezin kir û heger Partiya Karkerên Kurdistanê beriya xwe bi 20 salan derketiba, wê niha Kurdistan azad ba, lê di demeke ewlemê, têknolojiya û cîhan hemû lê bû yek hat. Tevî vê jî wê guhertinên dîrokî pêk anîn û têkoşîneke watedar ji bo gelê Kurd heya roja îro dide meşandin.

**Hûn weke malbatên şehîdên PKK’ê banga Rêber Apo ya ji bo “Aştî û Civaka Demokratîk” çawa dinirxînin?**

Rêber Apo di van salên dûr û dirêj hewl dida gelê kurd bi cîhanê bide qebolkirin û heya roja îro jî têkoşîna xwe ji bo vê yekê nedaye rawestandin. Lewra em bi banga Rêber Apo re ne, ji ber ku Rêber Apo dizane ji bo her pêvajoyekê çi pêwîst dike. Rêber Apo dibêje; “Ji salên 1991’an de şerê me şerekî dubare ye”, dîsa jî vê dibêje; “Li ser asta malbatan çiqasî dijminahiya hev bikin, lê di dawiyê de wê li hev bên, tevger jî wisa ne, dewiya hemû şeran aştî divê pêk, lewra aştî çiqas zû pêk bê baştir e,”Lê dewleta Tirk mirovên şofînîstin, dirûşmeyên wan gur e û gur ewqasî xedare, lê her çiqasî dewleta Tirk li derdora PKK’ê çû û hat, nikarîbû bi PKK’ê, ji ber ku Rêber Apo bi izemeta xwe li ser vê yekê disekine.

**Li ser banga Rêber Apo PKK’ê gavên tewrîk pêk anîn û Kongreya xwe ya 12’emîn li dar xist, lê heye niha dewleta Tirk bi cidiyet nêzî vê yekê nebûye, hûn nêzîkatiyên dewleta Tirk çawa dinirxînin?**

Dewleta Tirk gihişte wê encamê ku êdî şer bi PKK’ê re nema tê kirin û wê ew li hemberî vî şerî têk biçe. Tevî ku Rêber Apo ji sala 1991’an de ev gotibû; Dewleta Tirk bi şer nikare me tune bike, lewra çareserî ew e ku em bi hev re rûnên”, lê dewleta Tirk tim dixwest çiroska vê şoreşê vemirînin û digotin heya Rêber Apo vê şoreşê birêve bibe ew têk naçe. Lewra Rêber Apo girtin û komployeke navdewletî li ser dan meşandin. Lê berxwedan bi girtina Rêber Apo nehat rawestandin, berovajî wê qonaxa guhertinê dest pê kir û PKK’ê di nava çiya de her roj xwe nû kir. Di heman demê de jî Şoreşa Rojava ji aliyê PKK’ê ve hat biserxistin, wê demê Dewleta Tirk dît ku Rojava jî biser dikeve, tevî ku wê herêmên Rojava dagir kirine, DAIŞ, Cebhet Elnesra û gelek çeteyên din bi ser Rojava de şandin, lê bê sûd bû. Herwiha bi belafiran bi şev û roj li gerîla dixistin, encam negirtin. Ji ber ku PKK’ê roj bi roj mezintir dibe û teknîka wê xurtir dibe. Lewra dewleta Tirk hesab kir ku ew biser nakeve, êdî ji xwe re gotin em bi rêya mofawedatan li hev bicivin û bawer nedikirin ku wê Rêber Apo bangekî dîrokî bike, lê dema Rêber Apo ev bang kir, di vir de cîhan bi taybet dewleta Tirk matmayî ma, êdî heger dewleta Tirk gavên piratîkî ji bo vê pêvajoyê navêje ewê têkçûnê jiyan bike. Ji ber Dewleta Tirk di demên berê de nikarî fen li PKK’ê bikra niha jî nikare, hem jî PKK’ê bi guhertin îro serkeftina sibê bidest dixe.



## Bersiva pirsê, Xweserî û QSD’ê misogeriya Sûriyê ne!

**Dilyar Cizîrî**

Piştî hilweşîna rejîma malbata El-Esed a zêdeyî 53 salan desthiladariya Sûriyayê bi dest xistibû û li gorî berjewendiyên xwe hemû qadên welat kontrol dikirin, gelek pirs di nava civaka Sûriyayê de belav bû. Ev pirs bi taybet li ser çarenûsa hêzên Sûriyaya Demokratîk (QSD) û Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê dizîvirin. Ev piştî hevdîtinên dawî yên di navbera şandeya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê û desthilata Şamê de ku encamên wê yên destpêkê bi vegera lihevkirina Heleb û Şêxmeqsûd û pêkanîna qonaxa duyemîn a serbestberdana dîlgirtiyan di navbera herdû aliyan de û paşê lihevkirina li ser mijara xwendekarên Bakur û Rojhilatê Sûriyayê yên metiriyalên Hikûmeta Şamê dixwendin, tacîdar bû zêdetir bûn.
Li gorî herêman pirs têne guhertin, bi wate alîgirên desthilata Şamê li gorî berjewendiyên xwe û aliyên piştgiriya xwe ji wan digirtin û di serî de dewleta Tirk a dagirker vedibêjin.
Di serî de dibêjin mane “Sûriyayê ji rêjîma Esed rizgar bûye, çi karê QSD’ê maye, gerek xwe fesex bike û wekî kes tevî nava Artêşa Sûriyê ya nû bibin” dibêjin Rêveberiya Xweser a 14 salin rêveberiya herêmê dike û sîstema hevgirtina civakî pêş xistiye, hilweşe û saziyên dewletê li Bakur û Rojhilatê Sûriyayê şûna wê bigirin. Ragihandina desthilata Şamê û dewleta Tirk a dagirker li ser van pirsan hemû rojevên xwe ava kirine.
Li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyayê jî civak heman pirsê bi rêbazekî din pirs dike “Eceb piştî ewqas şehîd û destkeftiyên mezin wê çarenûsa me çibe, eceb raste wê çeteyên li Perava Sûriyayê komkujî pêk anîn, werin herêmê me jî. Eceb wê pêşeroja zarokên me yên xwendekar û saziyên me bi rêve bibin û em û zarokên xwe di wan de kar dikin, çi be? Welhasil di vê çarçoveyê de gelek pirs li ber guhê me dikevin. Beşek mezin ji civaka me yên dûrî saziyên rêveberiya xweser bûn, ji bandora navendên şerê taybet ên desthilata demikî ya veguhêz a Şamê û dewleta Tirk a dagirker bi bandor dibin, vê metirsînê di nava civakê de zêdetir dikin.
Di vê nivîsê de ez ê hewl bidim bi awayekî beşî be jî bersiva van pirsan bi çend movikan bidim. Ji bo bersiveke bi rêk û pêk were dayîn, em mecbûrin bi kurtasî be jî behsa salên derbasbûyî yên sîstema Rêveberiya Xweser û dîroka hêza wê ya leşkerî QSD’ê bikin. Di nava şert û mercên herî zehmet de ev sîstem li ser bingeha piradîgma Netewa Demokratîk a xwe dispêre felsefeya Rêber APO. Ev felsefe li ser bingeha Berxwedan Jiyane mezin bûye. Berxwedana civakî ya li ser esasê edalet û wekheviyê pêş ketiye û di şert û mercên herî zehmet de gavên herî mezin qezenc kir.
Îcar niha bi ketina vê sîstemê nava sîstema Desthilata Şamê de nayê wê wateyê tunebûna wê ye. Berûvajî wê hêza sîstema Rêveberiya Xweser a xwe dispêre hevgirtina civakî misogeriya sererastkirina tevahî sîstema Sûriya demokrat a ne navendî ye. Ji ber wê bela gelê Sûriyayê û di serî de civaka Bakur û Rojhilatê Sûriyayê ji beşdarbûna nava saziyên desthilata Şamê rehet be. Çiqas planên hindir û derve hebin jî wê sîstema QSD’ê û Rêveberiya Xweser ên din di nava xwe de bihelîne û ne gengaze ew karibin bandoreke mezin li ser bikin.

# Di kaosa şerê cîhanê yê sêyemîn de rola Îsraîlê

**Volqan Elî**

Rojhilata Navîn di şerê cîhanê yê sêyemîn de ketiye pêvajoyeke nû. Hêzên navdewletî yên hegemonîk her çendî li ser dîzaynkirina herêmê ne hemfikir bibin jî, di şerê li ser pêvajoyeke dûr û dirêj belav bûye de gihaştine nêrîneke hevpar. Sînorên Sykes-Picot ku di 1916’an de hatibûn çêkirin îro êdî tenê li ser nexşeyê maye. Ev nîşan dide ku sîstema herêmê ne tenêe di pêvajoya hilweşînê de ye, bi rengekê hîn kûrtir, wateya wê jî nemaye. Ji ber ku ev pergal di sed sala 21. de dest pê kir hilweşiya. Destwerdana ku bi Iraqê dest pê kiriye, tevgerên gelan ku bi Bihara Ereban berdewam kiriye, şerên wekaletê, pêvajoya ku Îsraîlê bi 7’ê Cotmehê daye destpêkirin, stratejiya DYE’ê yên paşde kişan û vegerê, mezinbûna tifaqa Rûsya-Îran û paşê jî sînordarkirina wê, nexşe û mantiqa Sykes-Picot bê mane kiriye. Ji ber vê yekê li Rojhilata Navîn pêvajoyeke nû ya wisa dest pê kiriye ku wê herêm ne bi nexşeyên hatine diyarkirin were bi rêvebirin, bi rolên hatine diyarkirin were bi rêvebirin. Em di qonaxek wisa de ne, stûnên ji aliyê netewe-dewlet û projeyên herêmê yên desthilatdariya merkezî ve dihatin hilgirtin, êdî şikestine. Her wiha tê xwestin ku êdî li Rojhilata Navîn ne tenê bi nexşeyan were bi rêvebirin, bi aktoran were meşandin; hin ne tenê bi sînoran were diyarkirin, bi pozisyonan were diyarkirin. Di vê rewşa nû de hatiye li ber wê qonaxê ku li derdora DYE-Îngîltere û Îsraîlê pergaleke nû were avakirin. Di vê pergala nû de, feraseta berê ya hakimiyetê ku xwe dispart netewe-dewletê na, modeleke rêveberiyê ya parçe bi parçe, zeyif û pir navendî ye, lê ji bo kontrol û kordîneyê jî vekiriye derdikeve pêş.
Ji bo vê yekê jî pêkhateya herî balkêş Îsraîl e. Di dema borî de di pozisyoneke wisa de bû ku ewlekariya wê hatibû girtin û derdora wê hatibû xistin binê parastinê. Îro jî di rewşeke hegemonîk a wisa de ye; xwe û derdora xwe diguherîne û vediguherîne, rejîmên Kendavê beralî dike, korîdorên ekonomiyê dixe binê kontrolê, ewlekariya xwe di ser her tiştî re digire, ji pêvajoya entegrasyona leşkerî û teknolojîk re pêşengî dike. Ji ber vê yekê, di vê pêvajoyê de hêza ji bo pêvajoyê herî bi amadekarî îsraîl e; li derdora xwe rejîmên li gorî wê ne û pergala aktorên bê hêz ava dike.
Îsraîl bûye aktoreke wisa ku hêzên dijberê Îranê zindî dike û saxlem dike. Ev nîşan dide ku êdî li herêmê hêza hegemonîk, rasterast ne hêzên hegemonîk ên Rojavayî ne, hêza dendik a hegemonyaya hêzên Rojavayî li herêmê Îsraîl e. Normalîzebûna Îsraîlê li cem cîhana Erebî, di rastiya xwe de ne ku rewşa pevneçûnê afirand; planeke veguherînê ya nû ya wisa ya hegemonîk e ku şiklê pevçûnê guhert. Filîstîn êdî ne di navendê de ye; li qiraxê ye. Îran tê tecrîdkirin lê ev ne dorpêçeke leşkerî ye; bi şiklê xeniqandina dîplomatîk û ekonomîk tê meşandin.
Ji nû ve bi rêzbûna dewletên herêmê vê piştrast dike. Îran bi paş dikeve lê hê jî li ber xwe dide. Rûsya heyê lê bê bandor e. Dewletên Kendavê bi hêz dibin, lê ev ne ku bi serê xwe pêk tê, wekî bibin pêveka (duvik) Îsraîlê dibe, dewletên wekî Libnan, Urdun, Misir êdî ne hêzên biryar girtinê ne; hêzên wisa ne ku li ser wan biryar tên wergirtin. DYE’ê, vê dîmenê bi modeleke nû ya ‘kaosa di binê kontrolê de’ dîzayn dike. Êdî hegemonyayên sabit na; beralîkirinên bi pir alî û rêveberî girîng in, cih û mekanên sînordar na, herêmên berfireh, ne tenê aliyê leşkerî, bikarhatin û rolên ku têne diyarkirin girîng in. Dixwazin ku pergala nû ya Rojhilata Navîn, bi sîstemeke ku lawaz e, parçe bi parçe bûye, bi bazirganiya navneteweyî vekiriye û bi kordîne bimeşînin. Li vê Rojhilata Navîn a nû, wê ne sînor ji nû ve werin diyarkirin û ne jî dewletên nû werin avakirin.



# Pêwîst e banga Rêber Apo li hewa nemîne

**Argêş Vîyan**




Ev nêzî 52 salin têkoşîneke mezin ya ji bona azadiya doza Kurd tê meşandin. Beriya Tevgera Azadiyê jî gelek serhildan û hewildanên ji bona dozê hatin kirin. Ji Seyid Rizayan heya Şêx Seîdan, Qazî Mihemedan heya Zerîfe Besê û Elîşêran, pir pêşeng derketin. Li hemberî wê jî gelek Komkujî, qirkirin, tinekirin û pişaftin li dijî gelê kurd pêk hat. Lê dîsa jî kurdan qet gav paşde neavêt û bi domdarî têkoşîn û berxwedaniya xwe meşandin. Heya ku şoreşa mezin ya di sala 1978’an li gundê Fîsê bi avakirina PKK têkoşîna azadiyê gehişte lutkeyeke bilind. Heya wê deme jî gelek neyarên ku naxwazin Kurd rêxistin bibin û doza azadiya Kurd deskeftî çêbibin, derketin holê. Lê bi berxwedaniya Cuma Tak, heya Mazlûm Dogan, Salih Kendal Heya Kemal Pîran ev hişmendiyên kevneperest hilweşandin û xwe mezintir kirin. Ev bû gava pêşveçûyîna Kurdan yên ku ji aliyê desthilatan ve hatine dabeşkirin. Piştre bi pêşengiya fermandarê mezin pakrewanê rojên azad Egîd (Mahsum Korkmaz) û hevalên di bin fermandariya wî weke Gozluklu Elî û Cemşîd (Ahmed Kesîp) bi teqandina guleya yekemîn li Dihê û Şemzînanê textê dagirkeran hejandin. Gelek ciwanên Kurdistanê xwe kirin pêtê agir, xwe bi ramanên Rêber Apo xemilandin û dijmin û neyarên Kurdan gotin di cîh da be, hejandin. Kurt û kurmancî Tevgera Azadiyê heya 15’ê Sibata 1999’an bi dîlgirtina Rêberê gelan Rêber Apo re qonaxeke têr û tijî derbaskir. Piştî dilgirtina Rêber Apo û pêvajoya girava Imraliyê berê şoreşê kete qonaxeke nû. Rêber Apo bi vîn û ramanên xwe hem ezmûneke mezin ya têkoşînê dan qezenc kirin.
Ev qonax jî, ji aliyê têkoşîna doza Kurd ve xwe gihande lutkeya berxwedana dîrokî. Ciwan piştî dîlgirtina Rêber Apo weke avê herikîn û peyama ku “Dîlgirtina Rêberê me, dîlgirtina me ye.” kom bûn û di cîhan û herêmê de cara yekem ev berxwedan û têkoşînên efsûnî hate kirin. Dema ku ev yek hatin kirin Tevgera Azadiyê jî li gor hindê xwe guhert û di veguhertinê re, xwe derbas kir. Qasî êrîşên dijmin dijwar bûn, bersivdayina êrîşan jî ewqasî xurt bû. Hêzên leşkerî yên ku di şikeftên parastinê de tevî bê derfetîyan hatibûn çêkirin, bi vîna Apogerî berxwedanî kirin û bersiva wan êrîşan dan. Bi rihê Girêsor, Amediyê, Minbicê heya Bendava Şehîdan şer serxistin û dijminê dagirker neçar ma gav bi şûnde bavêj e. Li gorî wan pêşveçûnan serokê Partiya Netewperest ya Tirkîyê (MHP’ê) Dewlet Bahçelî 23’ê Cotmeha 2024’an de axivî û got: “Pêwîste mafê hêviyê ji Abdullah Ocalan re bê dayin.” Piştî wê axaftinê biraziyê Rêber Apo Omer Ocalan çû girava Imraliyê li gel Rêber Apo hevdîtîn pêkanîn.
Ev hevdîtin nîşaneya destpêkirina hêviyên nû û di heman demê de jî encama têkoşîna salan bû. Rêbertî bi dîlgirtina xwe ya 26 salan de dewlet û desthiladarên hegemon hemû neçar kirin ku ji aliyê kurdan ve bêjin ku “Pirsgirêkeke mezin heye û divê demildest were çareserkirin.” Rêber Apo da nîşandan ku bi şer û êrîşan nikarin vîna Kurdan ya ji pola têk bibin û Kurd dikarin li hember her cûre êrîşan jî berxwe bidin.
Piştî wan pêşketinan Rêber Apo bi riya desteya DEM Partiyê peyamek şand û bangek bi navê “Banga Aşitî û civaka demokratîk” şand. Ev bang ji aliyê cîhanê ve pir bi baldarî hate şopandin û bi girîngî hat guhdar kirin. Tevgera Azadiyê li gorî wê bangê bi şêwazekê hemdemî kongireya xwe ya 12’emîn di dîroka 5 û 7’ê Gulanê lidarxist. Ev kongire bi banga Rêber Apo kom bû û hate diyarî kirin ji bona giyanê şehîdên mezin Alî Haydar Kaytan (Fuat), Riza Altûn û Sirri Sûreya Onder. Ev kongrêye de, peyama serkeftinê hat dayin û dawî anîna şerê çekdarî hat kirin. Ji ber Rêber Apo gotibû ku “Pêwîste PKK xwe di guhertin û veguhertinê re derbas bike.” Ev bang hem ji bona PKK’ê derfeta guhertin û veguhertina têkoşîna nûjen e û ji bona hikûmeta Tirkiyê jî derfetên bi dawî kirina gengeşe û aloziyên herêmê ye. Ev radestbûyine weke ragihandina şerê taybet dinirxîn e. Rêber Apo ji bona her du aliyan derfeteke mezin avakir, pêwîste baş bê nirxandin. Ji ber ku ezmûnên Rêber Apo yên Neteweya Demokratîk li Bakur û Rojhilatê Sûriyê berbiçavin û dê bibe modela cîhanê ya rêveberiyê. Li Rojava Kurd, Ereb, Tirkmen û Siryan hwd. Bi hev re jiyan dikin, çima li Tirkiyê Kurd, Laz, Tirk û Gurcî nekaribin bi hev re jîyan bikin? Ji ber wê em dibêjin gelek kesan axivîn û pêşniyar jî kirin. Li gorî pêşniyara Rêber Apo kiribû, li gel hemû aliyên parlemento û derveyi parlemento jî hevdîtin hatin çêkirin, ji bona pêvajoyê bidin fêmkirin. Dê ji bona serxistina vê pêvajoyê jî, mirov nikare keda şehîdê mezin Sirri Sureya ji bîr bikin. Gelek kesan jî di derheqê van mijaran de, nêrîn didin û pêşniyar dikin çima pêkanîn nîn e? Tê gotin ku hîn destên veşartî nahelên pêvajo serbikeve? Pêwîste yên wisa bidin xuyakirin û di nav gel de bê darizandin û weke tawanbarên şer bidin xuyakirin. Pêwîste sozên tê gotin bên pêkanîn jî. Destpêkê jî rewşa Rêber Apo jî di nav de, pêwîste ku girtiyên nexweş di ber çavan re bên derbaskirin. Divê her Kurdistaniyê ku neçarî ji ber zextên dewletê koç kirine bi rengekê demildest vegerin warên xwe û dagirkeriya tirk û çeteyên wê ji wan deveran derkevin. Divê bersiv ji banga rêber Apo re tenê di gotinê de nemîne û dewleta tirk jî gavên ber bi çav bavêje.

## Tirkiyê; ji bo HTŞ û DAIŞ’ê belê, ji QSD û Kurdan re na!



**Zekî Bedran**

Rejîma Baasê li Sûriyê bi dawî bûye, lê ti şoreş çênebûye. Sedema vê yekê ew e ku gengaz e ku HTŞ li Şamê li ser desthilatdariyê ye. HTŞ ji aliyê hişmendî ve li dijî demokrasiyê ye.
Ew bi hişmendiya El Qaîdeyê hatine perwerdekirin û ol li nijadperestiya erebî zêde kirine. Ev tê wateya şêweyekî hikûmetê yê pir navendî û li ser bingeha zordariyê. Di vê şêwaza rêvebirinê, gelê Sûriyê wê bêriya serdema Baasê jî bike.
Duyemîn bextreşiya mezin a Sûriyê hebûna Tirkiyê wekî hêzek dagirker û hewldanên wê yên ji bo serwerî avakirina HTŞ’ê ye, ku ew piştgiriyê dide wê. Tirkiye avahîsaziya siyasî ya zordar û fetisandinê li ser gelê Sûriyê ferz dike.
Sedema sereke ya vê yekê dijminatiya wê ya li hember Kurdan e. Dijminatiya li hember Kurdan dibe sedema ferzkirina dewletek neteweyî ya pir navendî li ser gelê Sûriyê ye. Tirkiye dibêje ku çi dibe bila bibe, divê Kurd nebin xwedî deskeftîyan. Ji ber vê sedemê, ew li dijî azadiyan û avahiyek demokratîk e. Ew hêz û derfetên di destê xwe de bikar tîne da ku bêje divê Sûriyê dewletek yekgirtî be û rêveberî yekalî û navendî be.
HTŞ dizane ku ew ne ewqas bihêz e ku bi hêza xwe aboriyek hilweşiyayî û welatekî wêranbûyî dîsa ji nû ve ava bik e. Gelê Sûriyê piştgirîya şêwaza rêvebirina HTŞ nake. Tirkiye hemû hêza xwe bikar tîne da ku HTŞ li ser piyan bimîne û bibandor be. Li Sûriyeke demokratîk de, ew nikare li herêmên ku dagir kiriye bimîne. Ger gel rêxistinkirî be û xwedî vînekê be, ew ê serdestiya hêzên derve ne pejirîn e. Ji bo ku bandora xwe li Sûriyê biparêze û hebûna xwe ya leşkerî rewa bike, Tirkiye dixwaze HTŞ serdest bike. Ji aliyekî din ve, Tirkiye dixwaze QSD’ê ji hevkêşeyê derxîne. Ji bo vê armancê, bi DYA’yê re danûstandin kiriye. Tê fêmkirin ku wan li hev kiriye. Tê zanîn ku komeke xebatê ya sêalî ya DYA, Tirkiye û Sûriyê hatiye damezrandin. Armanca vê yekê ew e ku ev hêza şerê li dijî DAIŞ’ê, kamp û girtîgehên çeteyên DAIŞ’ê bigirin li ser milê xwe. Di vê rewşê de, êdî pêwîstiya DYA bi QSD’ê namîne. Tirkiye ji bo bêbandorkirin û ji holê rakirina QSD’ê bênavber xebitî. Bi salan e, bi alîkariya DYA re PKK’ê bi tometa terorê tawanbar dike û zextê li ser wê dike. Lê DYA û hêzên hevpeymana navnetewî ferzkirinên Tirkiyê yên ku dixwestin ne pejirandin. Niha, bi hatina Trump ser desthilatdariyê, rêveberiya Erdogan hewldanên xwe zêde kiriye.
Şandeya danûstandinê yên Rêveberiya Xweser û Şamê dest bi hevdîtinan kirine. Wan daxuyaniyek ji çar xalan pakêtên ku di derbarê çareserkirina hin pirsgirêkan de dan. Her wiha hat ragihandin ku ji bo avakirina desteyên ji pisporan pêk tên lihevkirinek çêbûye. Ev pirsgirêkên çareserkirî di qonaxek pêşerojê de bi rêveberiya Şamê re hatin nîqaşkirin û lihevkirinek çêbû. Lê, HTŞ ti gavên pratîkî neavêtiye. Di vî warî de, astengî hatine derbaskirin û ne hewce ye ku meriv bifikire ku pirsgirêk dê êdî werin çareserkirin. Ji ber ku HTŞ ji bilî avahiyek pir navendî û tevlîkirina herêmên xweser di nav wan herêman de cuda ti nêrînek din tine ye. Tirkiye jî zextê li HTŞ dike ku QSD û Rêveberiya Xweser ji holê rake. HTŞ ji hêla hişmendiyê ve jî, ji dewleta Tirk ne cuda ye. Ev rewşek e ku li peyman û çareseriyê gefan dixwe. Herêmên xweser, gelê Kurd û partîyên kurd heta niha di ti xebatên avakirina Sûriyê de nehatine tevlî kirin. Destûra demikî û hikûmeta damezrandî bi tevahî biryara HTŞ bû. Ew dixwazin hebûna QSD bi dawî bikin, lê ewlehiya gelê herêmê dê çawa were misoger kirin? Teqezkirina destûrî tine ye. Tirkiye her tim dixwaze ku fikarên ewlehiya xwe li ber çavan bên girtin û wer e, mîsoger kirin. Lê ew qet ewlehiya Kurdan û gelên herêmê naxîne rojevê. Wezîrê Parastina Netewî yê Tirkiyê di daxuyaniyekê de ragihand ku ew ê hêzên xwe yên leşkerî ji Sûriyê venekişînin. Wisa got, “Heta ku terorîzm bi dawî nebe û ewlehiya sînorên me neyê misogerkirin, em ê vekişîna leşkerên xwe nîqaş nekin.” Ji bo Tirkiyê kî li Sûriyê terorîst e? Dema ku Tirkiye dibêje terorîst, ji bilî QSD û YPG’ê mebesta wî tu kesê din nîne. Tenê fikara wê tinekirina Kurdan û Rêveberiya Xweser e. Ew bi DAIŞ’ê re jî nêzîkî hev in, çawa ku nêzîkî HTŞ’ê bin. Dema ku DAIŞ’ê êrîş herêmên sînor ên Tirkiyê dikir, rêveberiya Erdogan qet negot ku sînorên min di xeteriyê de ne. Dema ku DAIŞ ji wir hate derxistin û herêmên Rêveberiya Xweser hatin avakirin, Tirkiyê li ser sînoran dîwar ava kir û got ku sînorên min di xeteriyê de ne.
Trump ti eleqeya xwe bi demokrasiya li Sûriyê nîne. Me gelek caran li ser vê yekê nivîsandiye; ew dixwazin ku Sûriye di bin Peymana Îbrahîmî de be û bin serweriya wan de bimîn e. Her çend piştî vê yekê rejîmek ji Baas’ê xirabtir hat damezrandin jî, ev ji bo wan ne pirsgirêk e. Mixabin, gelê Sûriyê ne rêxistinkiriy e. Gel nikare di navbera xizanî û ewlehiyê de bifikire, ew nikare rêya pêşveçûnê bibîne. Bê guman, ger ew hişyar û rêxistinkirî bin, ew ê xwedî hêz bin ku li dijî vê fen û lîstikan biseknin. Di vî warî de, pêdiviya herî mezin a gelê Sûriyê ew e ku xwe birêxistin bike û yekîtiya xwe misoger bike. Hêza herî guncaw ji bo pêşengiya vê yekê Rêveberiya Xweser e. Di vî warî de, Tirkiye dixwaze bi çêkirina peymanek bi DYA û bi hevkariya HTŞ’ê QSD û Rêveberiya Xweser ji holê rake. Mîna ku pirsgirêka herî lezgîn a Sûriyê hilweşandina QSD û jiholêrakirina rêveberiyên azadîxwaz û demokratîk ên ku li herêmên xweser hatine damezrandin be!



## Rojnameya Serxwebûn a Yekem

**Farûk Sakik**

Kongreya PKK’ê ya 12’êmîn bi feshkirina partiye re biryarek din jî girt û dawî li kovara Serxwebûnê anî. Rojnameya Serxwebûn 44 sal şûnde bi hejmara 521’an xatir ji xwendekaran xwest. Min xwest kurte dîroka hejmara yekemin serxwebûnê bi were parvekim.
Dema amedekariya civîna partîbûnê ya Koma Apociyan, dihat kirin, li aliyekî jî Komîteya ragihandinê ku ji Mazlûm Dogan, Duran Kalkan, Hayrî Dûrmuş û Kesîre Yildirim pêk dihat, hatibû avakirin.
Di germahiya Tîrmeha sala 1978’an de Rêber Apo di 3-4 rojan de 140 rupelên defterê nivîsî bû. Di nav komê de 2 kesan dizanibûn ku Daktîlo bikarbînin. Mazlûm Dogan û Duran Kalkan. Piştî ku Rêber Apo Manîfesto temamkir, wan jî di 4-5 rojan de bi daktîloyê redekte kir. Ev manîfesto, bingeha partiya ku dixwestin avabikin bû. Dîsa biryar dabûn ku di kovara yekem de ev Manîfesto were weşandin.
Li Dersimê, li ser redaksiyonê xebatan dest pê kir. Lê ji ber ewlekariyê û guhertina cîh, vê redaksiyonê demeke dirêj dewam kir. Derbasî navenda Dersimê û ji wê derê jî derbasî Depê, mala Sakîne Karakoçan bûbûn. Li vê derê, piştî nîqaşên redaksiyon temam kirin. Di encamê de ecibandin û biryar dan ku êdî hejmara yekem kovarê amade ye. Ji Abdullah Ocalan jî xwestin ku nivîseke taybet li ser derketina Sexwebûnê binivîse. Li ser nav jî herkes hemfikr bû. Navê Serxwebûnê tiştekî taybet bû. Ji bo peyamekê jî bidin gelê Kurd ev nav ecibandin.
Navenda xebatên wan jî li Xarpêtê bû. Ji bo çapê amûrên lazim bi têkiliyên xwe yên sînorkirî peyda dikirin û dibirin Xarpêtê. Li wêderê avahiyek hatibû kirêkirin. Hemû xebatên çapê li vê derê dihatin birêvebirin. Dema ku ev der eşkere bû, derbasî navenda Çewlikê bûn. Hemû amûrên komkiribûn jî derbasî Çewlikê kirin. Li mala Zekî Yildiz bûn. Zekî Yildiz, Ahmed Bayik û Huseyîn Durmuş jî tevlî xebatên çapê bûbûn.
Li Çewlikê 3 rojan ketin û derketina wê malê hat qedexekirin. Bi şev û roj dest bi çapkirina Serxwebûnê kirin. Her tişt temam bûbû, lê berg lazim bû. Duran Kalkan ji bo vê yekê çû Enqerê. Wî malzeme tedarîk kirin û vegeriya Amedê. Rûpela destpêkê û berga kovarê ji aliyê Mazlûm Dogan ve li Amedê ji berê de hatibû amadekirin. Wî logo amade kiribû û şiyara Serxwebûnê jî ev bû: Ji serxwebûn û azadiyê bi rûmetir tiştek nîne. Amûrên ku ji Enqerê anîbûn, sererastkirin û dest bi çapa berga kovarê kirin. Logo û nivîsa ku Mazlûm Dogan amadekiribû jî bi cîh kirin. Rêber Apo jî hatibû li wê derê, li wê sîstemê temaşe kiribû û ecibandibû.
Di payiza sala 1978´an de, êdî amedekarî temam bûbûn û 500 berg derbasî Çewlikê kirin. Li vê derê, çapa esas dest pê kir. Carinan ji ber ku teknîk tunebû, bi dest ev yek dikirin. Di rewşeke weha de di destpêka meha Cotmehê de, êdî hejmara yekem a Serxwebûnê amade bû.
Ji 500 nusxeyî, 350 nusxe jî di depoyekê de veşartin û 150 kovar jî di valîzekê de ji bo belavkirinê radestî Huseyîn Durmuş kirin. Huseyîn Durmuş berî ku van kovaran belav bike, di kontrolekê de ji aliyê Polîsan ve hat girtin. Di dest wan de bi tenê yên di depoyê de mabûn. Wan dest bi belavkirina van kir. Belavkirina van Serxwebûnan jî sînordarkirî bû. Bi tenê digihişt dest kadroyan û hin welatparêzan. Dîsa Serxwebûn di perwerdehiya kadroyan de jî dihat bikaranîn. Kadroyên komê piştî xwendina manîfestoyê dest bi nîqaşan kiribûn. Di rûpela yekem de bi nivîsa bi navê “Destpêk” polítîkaya weşana kovarê hatibû destnîşankirin û di dawiya nivîsê de jî hatibû gotin; “Biryardariya me ya şerma statuya ku Kurdistan tê de ye, ew ê di têkoşîna me de bibe çavkaniya serketinê.”
Piştî hejmara yekem cesaret nedikirin ku hejmara duyem derxin. Ji ber ku digotin, em bi ti awayî nagihîjin asta hejmara yekem. Di navbera salên 79 û 80´yî de, 5 hejmarên taybet hatin çapkirin. Bi hatina darbeya eskerî ya 12’ê Îlonê re Kovara Serxwebûnê, navber da weşana xwe. Salekê piştî darbeya 12’ê Îlonê, li derveyî welat, li Ewrûpayê, di 1´ê Çileyê 1982´yan de, ji nû ve dest bi weşanê kir. Ji aliyê PKK´ê ve ev hejmara hanê fermî, wek hejmara yekem hat pejirandin.